

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 117
Heziran
1991
Buha: 15 Skr.
3 DM

Armananc

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 117
June
1991
Price: 15 Skr.
3 DM

Kurd û Seddam hîn jî li ber hev didin

Guftûgoyên otonomiyê di meha sisyan de jî bê encam man. Seddam Huseyin jî bo pêkanîna otonomiyê hin şertên din ên giran dan ber Cepha Kurdistanê.

Cepha Kurdistanê xwe nade ber şertên Seddam. Mesûd Barzanî jî bo hevdudîtinên nuh wê cardin biçe Bexdadê.

"Seddam dest daniye ser Mesûd Barzanî", "Mesûd Barzanî li gel îmzekirina otonomiyê ye Celal Talabanî li dijî e". Spekulyasyonên bi vî rengî gelek çêbûn. Di gel xelkê Kurdistanê Iraqê, Kurdên li her çar perçan û yên li derveyî welat û bi mereq û endîşe li benda guftûgoyan in. Herwest guhên wan mûçkirî li hêviya nûçeyên teze ne... Bêdengiya Cepha Kurdistanê Iraqê, demeke dirêj nekirina Mesûd Barzanî, ne bi tenê rê li spekulyasyona vekir, lê pirs û gumanên berê jî xurttir kirin.

Guftûgoyên otonomiyê di 20'ê Nîsanê de çûna wefteke (heyetek) bi serokatiya Celal Talabanî, bo Bexdadê dest pê kirin û hefteyekê Kurd li gel nûnerên hukûmetê peyivîn. Li Bexdadê piştî hin beyanên optimîst û ne di wextê xwe de, Celal Talabanî, dema vegeriya Kurdistanê weha got: "Hê di navbera



Yekîtiya Kurdan wê jî bo girtina otonomiyêke rastîn bes be?

cephe û hukûmeta I-raqê de gelek pîrsgirêk hene. Ji bo îmzekirina peymanekê hîn gelekî jî hevdu dîr in. Bi tenê li ser hînek pîrsan peyivîne. Ev îş wê hîn bi mehan bajo".

Di tûra duyem ya guftûgoyên otonomiyê de bi serokatiya Mesûd Barzanî wefdek di 6'ê Gulanê de çû Bexdadê. Mesûd Barzanî di 9'ê Gulanê de di derheqa guftûgoyan de beyanek kurt da; "Guftûgo dom dîkin. Me heta nuha gavên gelek pozîtîv û pêşketî avêtine. Ez bawer dikim ku emê bi ser Kevin.

Di 17'ê Gulanê de M. Barzanî beyaneke din da; "Wefdên me li ser peymanê dixebîtin. Gavên pozîtîv hene. Peyman li ser temambûnê ye. Me hîn li ser hînek xalan li hev nekiriye. Ez bawer dikim ku di demeke kin de wê peyman bê îmze kirin".

Di 18'ê Gulanê de Mesûd Barzanî civînek çape-menî çêkir û piştî wê jî Otel Reşîdiye bar kir. Bar kirina Mesûd Barzanî jî Otêla Reşîdiye di çape-

Dûmahîk r. 11

Mesûd Barzanî:

"Seddam ji sedî 70 daxwazên me qebûl kirin"

"Seddam ji sedî 70 daxwazên me qebûl kirine. Em çiqasî jê biçirpînin ji me re baş e."

"Bi ya min ne problem e ku Kerkûk ji Kurdan re be, yan na. Jixwe ya Kurda ye."

Roza Dîlan/Seqlawa

Piştî ku Mesûd Barzanî ji Bexdadê vegeriya, civîneke mezin bi berpirsiyarên herêman û serokêşîran re çêkir. Civîn ji pressê re girtibû. Lê me fersend dît ku xwe bigihînin M. Barzanî. Pîrsa min a pêşî li ser armanca civîna ku ew hîn nuh jê derketibû.

"Me hesab kiribû ku Mam Celal jî wê li vir baya, ji ber ku me biryar dabû ku li ser pîrsa otonomiyê civîneke fireh çêkin. Lê Mam Celal negihîşt. Me jî wek Cephe bi serokêşîr û berpirsiyarên herêman re li ser metna otonomiyê ku ji sedî 70 jî teref Seddam ve hatîye qebûl kirin, civînek çêkir û agahdarî da wan."


-Baş e herkes jî wê metnê memnûn e?

-Herçiqas çerçewa peymanê kêm dibînin jî, lê bi tevayî memnûn in.

-Di guftûgoyan de hîn gehîştin kîjan qonaxê?

-Em gehîştin qonaxê baş. Me ji sedî 70 daxwazên xwe, bi wan dan qebûl kirin, ji sedî 30 maye, ji wê jî em çî biçirpînin ji me re baş e.

-Çima guftûgoyên bi Seddam re hewqas dirêj ajotin. Û daxwazên we yên ku ji sedî 70 hatine qebûl kirin, çima bi peymanekê nabin



qanûn?

-Ev serê sî salan e ku em hevdu dikujin. Heta îro li dijî Kurdan nêzî 300 qanûn derketine. Bi carekê guhertina van qanûnan jî ne mumkun e. Wê wextekê bigre, ev jî normal e. Çimkî divê hukûmet van qanûnan biguhere û li şûna wan hin qanûnên nû derxe. Ev jî ne karekî hêsan e.

-Baş e, ger Seddam di kerta dawî de ji gotîna xwe vegere û daxwazên we qebûl neke, hûnê çî bikin?

-Seddam ji sedî 70 daxwazên me qebûl kirine. Ji bo vê gavê ev bes e. Û bi wan şertên ku hatine qebûl kirin rê li ber şer jî hatîye

Dûmahîk r. 11

Li Diyarbekirê terora dewletê

Sê bombe teqiyên



Piştî teqîna bombê, tirimbêla Mustafa Ozer...

Ev serê du heftan e ku Li Diyarbekirê bombe diteqîn.

Pêşî di 17.6.1991'an de, nivê seve seet di 02.00'an de li ber

mala serokê berê yê HEP (Partiya Ked a Gel-Halkin Emek Partisi)ê li Diyarbekirê Mustafa Ozer, bombeyek di tirimbêla wî de te-

qiya û tirimbêla wî peremperçê bû.

Dûmahîk r. 11

Hevpeyvîn bi Samî Abdurrehman re

rûpel: 3

Zimanê Kurdî yê lîteraturî; asteng û problem / Bavê Nazê

Rûpel: 5

Osman Aytar: "Îşkence di ganî merdim kesey û kamiya xo ya millî û de'wa Kurdey jî mudafe'a bikero."

rûpel: 10

Dewleta Kurd kabûsê gelekane e

rûpel: 4

Zinarê Xamc

Doktorên Kurd ji Kurdistana Iraqê vegeriyan

Ereban Dihok talan kirin

18 doktorên Kurd navên xwe nivîsandine ku biçin nav penaberên li ser sînoran. Li ser vê yekê Komela Doktoran ji Xaça Sor a Swêdî, ji rêxistina Parastina Zarokan, ji hukûmeta Swêdê, ji konsolosxanên Ingilîstan, Frense, Amerîka û yên din daxwaza alîkariya çûnê û ya dermanan kiriye, lê kesî xwe nedaye ber.

Dr. Ebdulbaqî Ehmed endamê Komela Doktorên Kurd li Swêdê ye. Ji nîsanê û vir de carekê bi heyeta rêxistina "Parastina Zarokan" ya Swêdî, cara din jî di gel du doktorên Kurd, bi riya Fonda Alîkariya Kurdistanê, du caran çûye Kurdistana Başûr û li kampên penaberên li ser sînoran, li deverên li jêr kontrola hêzên hevkar, geriyaye. Gava cara du-yem ji Kurdistanê vegehiya, di 27'ê Pûşperê de bi amadekirina Federasyona Kurdan li Swêdê, di civînekê de li ser gerên xwe peyivî. 18 doktorên Kurd navên xwe nivîsandine ku biçin nav penaberên li ser sînoran. Li ser vê yekê Komela Doktoran ji Xaça Sor a Swêdî, ji rêxistina Parastina Zarokan, ji hukûmeta Swêdê, ji konsolosxanên Ingilîstan, Frense, Amerîka û yên din daxwaza alîkariya çûnê û ya dermanan kiriye, lê kesî xwe nedaye ber. Nexwestine bi awayekî resmî 18 doktorên Kurd di gel dermanan bigihînin Kurdistanê. Çunkî kes naxwaze xezeba Tirkîye, Îran, yan Iraqê bixşîne ser xwe. Doktorên Kurd jî ji ber ku piraniya wan xwedî pasportên siyasî, yan insanî ne, nekarîne bi îmkânên xwe biçin; wîze pêwîst e, pere pêwîst in, derman û alet pêwîst in, organîzasyonê kar pêwîst e. Mixabin îmkânên rêxistinên Kurd yê siyasî û demokratîk jî tunebûne ku 18 doktorên Kurd di gel dermanan bigihînin nav nexweş û birîndarên xwe. Ji vê bigerin, li gor gotina Dr. Ebdulbaqî, Xaç Sor a Swêdî li ser hinartina alîkariyê ji Komela Doktoran re gotiye: "Em nikarin alîkariyê direk bigihînin destê Kurdan. Erê partiyên siyasî yê Kurd hene, lê tev li dijî hev in. Tu rêxistinên insanî, serbixwe yê Kurd tunene ku em bi riya wan alîkariyê bigihînin xelkê." Û lewra jî wekî tê zanîn piraniya alîkariya ku teslîmî Hîva Sor a Tirkî û ya Îranî bû, berî ku bigihe Kurdan, hat talankirin.

* * *

Piştî civîne, me kurtsohbeteke bi Dr. Ebdulbaqî re kir: - Kesên ku li ser sînorên Tirkîye û Îranê mane, çima venagerin?

- Min jî pirsî. Venagerin, çinkî baweriyê bi Seddam naynîn. Di tirsin ku wek carên berê, Iraqê êrişan bîne ser wan. Newêrin. Lê tev jî pir dixwazin ku vegehin Kurdistaneke azad û tena.

- Hêzên Kurd terefdarên vegeha xelkê ne, yan ne?

- Belê, giştî hêzên Kurd yê ku min dîtî, dixwazin xelk vegehin ser warên xwe.

- Kurdên penaber, yan yê ku vegehiyan, li ser guftûgoyên hêzên Kurd li gel Seddam çi dibêjin? Hêviya xwe li ser guftûgoyan girêdidin?

- Penaberên ku li ser sînorên Tirkîye mane, yê ku vegehiyan jî baweriyê bi guftûgoyên bi Sed-

Penaberên ku li ser sînorên Tirkîye mane û yê ku vegehiyan jî baweriyê bi guftûgoyên bi Seddam re naynîn. Lê bi ya min jî ber ku çi alternatîfeke din li ber wan nemaye, xwe mit dikin.

dam re naynîn. Lê bi ya min jî ber ku çi alternatîfeke din li ber wan nemaye, xwe mit dikin.

- Mirov dikare texmîn bike, di rewşeke weha de jiyana rojane ya normal tune. Lê kesên ku vege-

riyane, bi çi mijûl in? Gundên xwe ava dikin, yan li benda tiştê ne?

- Dest bi avakirina malên xwe kirine. Lê tiştê tune. Ne hesin, ne kevîr, ne tiştên nav malê. Bo nimûne berî hatina xwe û piştî wê jî leşkerê Iraqî li Dihokê hema bêje xaniyek jî ava nehiştine, tev hilweşandine. Paşê Ereben li Mûsilê bi kamyon û tirimbêlên xwe hatine û tiştên di xaniyan de jî talan kirine, ji xwe re birine. Rewşa nezelal jî karê avakirine girantir dike.

- Leşkerên Amerîkî û Îngilîz li bajarên Dihok û Zaxo û Amediyê hene. Li gund û bajarokên dûrî van bajarên Kurd dijîn? Ev dever di bin kontrola kê de ne?

- Leşkerên Amerîkî û Îngilîz bi tirimbêl û helikopteran xwe digihînin van deveran û kontrola deverê jî di destê wan de ye. Lê cihekê ku li derveyî xeta 36 dimîne, kontrol zehmet e. Rewşa xelkê jî li van dera xirab e: nexweşî pir in, derman û xwarin pir kêmtir e. Li nexweşxana Diyana çi derman nebûn, me dermanê ku ji Wanê kiribû bir wir. Xwarin buha ye. Lê xelk xanî û gundên xwe ava dikin, cotên xwe dikin, çêtir jî xelkê herêma din.

- Tu pêrgî leşkerên Amerîkî, yan Îngilîz hatî?

- Erê. Me li cihekê dûrî bajarên nexweşxaneyek ava kir ku em xizmeta xelkê li wir bikin. Leşkerên Îngilîz hatin. Ji me pirsîn ku me izina avakirina nexweşxanê jî kê standiye. Min jî wan re got ku ev der welatê me ye û em dixwazin xizmeta gelê xwe bikin. Lê di dawiyê de em mecbûr man ku jî wir bar bikin.

S. Rêving

Konferanseke li ser Kurdan

Di 26'ê Hezîranê de, Li Almanya, li bajarê Bremenê konferanseke e navnetewî li ser Kurdan hat çêkirin. Konferansa ji aliyê Belediya Bremenê li Mekteba Bilind a Bremenê bi navê "Konferansa Navnetewî li ser Rewşa Kurda Piştî Şerê Xelîcê" hat amadekirin.

Di konferansê de Prof. Ronald Mönch (Rektorê Mekteba Bilind a Bremen), Linda Chalker (wezîra Îngilîz), M. Bernhard Khouchner (wezîrê Fransîz), Prof. Dr. Michael Wolffsohn (ji Unîversîta Munîhê), Prof. Fathi Franzmathes (Mekteba Bilind a Bremenê), Dr. Kemal Fuad, Dr. Ferhat İbrahim (Unîversîta Azad a Berlinê), Omer Erzeren (Avukat), Sir Christopher Mallaby û nûnerên partiyên siyasî yê Alman wek axaftvan beşdar bûn. Konferansê tu biryar nestend û tu deklarasyon jî dernexist.

Seyrana Kurdên li Stenbolê



Li Seyrana Stenbolê koma muzîkê ya Kulîlkên Medya

Turcel Dîlan/ Stenbol

Ji sala 1986'an vir de bûye wek adet, di meha Hezîranê de xwendevan û karkirên Kurd yê ku li Stenbolê dijîn bi hev re diçin seyranê. Di van seyranan de bi hezaran Kurdên li Stenbolê tên ba hev, bi hev re şahiyê dikin. Îsal jî ev seyran di 16'ê Hezîranê de bi beşdarbûna 2500 kesan li ciyekî seet û nivêrî Stenbolê çêbû. Pênc hêzên welatparêz yê siyasî karê amadekirina seyranê dabûn ser milên xwe.

Seyranê bi xwendina "Ey Raqîb" dest pê kir. Li ser rewşa îro ya Kurdistanê bi Kurdî û Tirkî a-

xaftin hatin kirin. Li ser navê Platforma Netewî û Demokratîk ya Mamostan (ev platform ji alî mamostên Kurdan ve hatiye damezrandin) û li ser navê Platforma Netewî û Demokratîk a Jinan (ev platform jî ji alî jinên Kurd ve hatiye damezrandin) jî nûner peyivîn.

Koma Kulîlkên Medya û folklorê YDKD (Komela Kulturî ya Demokratîk û Welatparêz) reng dan seyranê. Piyaşa ku bi navê "Mele" hat listin gelek balkeş bû. Koma Dengê Azadî, dengbêjên wek Orhan, Roja û Xanemir jî di seyranê de beşdar bûn.

Dewleta Tirk

Rengên kesk û sor û zer qedexe kirin

Wezîrê Kar û Barê Hundir yê Tirkîyê Abdulkadir Aksu di 15'ê Hezîranê de ji waliyên herêmên Kurdistanê re ultîmatonek şand. Di ultîmatonê de tê gotin ku rengên kesk, sor û zer (bi hev re, li cem hev bin) li herêmê hatin qedexe kirin. Kesên ku van her sê rengan bi hev re ji bo çî be, bila bibin, bi kar bin, wê bîrê cezayê. Yanî kesên ku van rengan bi hev re li dikana xwe, li qehwexana xwe, li ciyê karê xwe bi kar bin, yan daleqîne wê di derheqê wan de dawê bê vekirin û ew wê cazayê hebê bixwin.

Li gor vê fermanê soforên tirimbêlan, otobusan û wasitên din wê nikarin di wasitên xwe de bi wan sê rengan eşyayên xelkê daleqînin. Zarok wê nikarin bi listikên ji van rengan bileyzin. Li gor vê qanûnê, wê sibê forma (cilên) Diyarbekirspor (taxima futbolê ya Diyarbekir) jî bibin sîc û di derheqê kulûb û listikvanan de jî dawê vebe.

Jixwe yek ji bendên "qanûna anti-terorê" ku çendek berê hat derxistin, ew bû ku astengan daye ber şiyarbûna gelê Kurd û tevgera wî ya milî wek terorîst bide nîşan dan.

Rastkirin

Di hejmara 116'an de di nivîsa Ehmed Huseynî de hin çewtî çêbûbûn. Di şûna çivçivêkeke zelal de çivçivêkeke zelal, di şûna tirsîyayî de tirsîyî yî bi çewtî hatibû nivîsin.

Em jî nivîskar û xwendevanan uzrê xwe dixwazin

Redaksiyon: M. Elî, Zinarê Xamo, Hesên Mizgîn, Mirza Bextiyar, Lewend Fîrat, S. Rêving
Redaktorê berpirsîyar: M. Elî
Berpirsîyarê beşê Dîmilki: Malmîsanîj

Adres: Armanc
P. Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden

Telefon: 46-8-803135
Telefax: 46-8-801825

Ansvarîgutfivare:
Kurdîska Demokratîska
Arbetar Unionen
Postglo: 50 37 90-9
ISSN: 0348 7385

Samî Rehman:

"Kerkûk ji bo hemû Kurdan bajarekî pîroz e"

Roza Dîlan, di rojên 24 û 25'ê Hezîranê de li Kurdistana Iraqê, li Şeqlawayê bi serokê Partiya Demokratîk a Gel a Kurdistana Samî Abdurrehman re ji bo Armançê hevpeyvînek çêkir. Li jêrê em beşek ji vê hevpeyvînê pêşkêşî xwendevanan dikin.

-Guftûgoyên di navbera we û rejîma Iraqê de nuha di çi merheleyê de ye. Çima weha dirêj kişand? Gelo ev jî ne taktîkeke Saddam be?

-Bi ya min guftûgoyên di navbera me û Iraqê de pir neajotin. Ev 30 sal in ku em şer dikin. Di navbera me de gelşên mezîn hene. Kes nikare bi derbekê helkirina van meselan ji me bipê.

-Bi qasî ku ez dizanim problem li ser Kerkûkê derdikeve, yanê wê Kerkûk daxilî otonomîyê bibe ya na. Tu dikarî hinekî qala vê mesele biki?

-Belê em dixwazin ku Kerkûk têkeve nav otonomîyê. Ew naxwazin. Lê ez bawer dikim ku wê çareyek muşterek ji ve gelşê re jî bê dîtin. Îro, Saddam ji tê de, tu kes nikare înkâr bike ku Kerkûk ne bajarekî Kurda ye. Kerkûk, ji alî wîjdan ve, ne tenê ji bo Kurdên Iraqê, ji bo hemû Kurdan bajarekî pîroz e. Tarîx heye. Li Kerkûkê Îcraatên Kurdan li meydana ne.

Îro Kurd nikarin li Kerkûkê nikarin ji xwe re xaniyekî bikirin. Nikarin ji xwe re xaniyekî çêkin. Bes dikarin xaniyê xwe tamîr bikin. Lê gava ku bixwazin dikarin bifiroşin. Armanca wan ew e ku li şûna Kurdan, 'Ereban bi cî bikin. Di van demên dawî de gelek 'Ereb anîn li vî bajarî bi cî kirin. Kerkûk ya jî bajarekî din, li derveyî sînoren otonomîyê binîn ji, aîdî Kurdistanê ne.

-Berî du hefteyan Tariq 'Ezîz hat Tirkîyê. Di beyanek xwe de got Kerkûk bajarê Kurda û 'Ereba ye û lewma jî wê daxilî otonomîyê nebe. Dûina te li ser vê gotinê çi ye?

-Em nabêjin 'Ereb li Kerkûkê tunene. Lê hin Kurd jî çûne li Basrayê bi cî bûne. Di rewşek weha de ma Basra dibe bajarekî Kurdan? Gorên (qabr) Tirkman û Asûriyan li Kerkûkê 20 sal berê jî hebûn, lê yê 'Ereban tune ne.

-Tê gotin ku hêzên Hevkar wê ji Kurdistana Iraqê derkevin. Hin hêz diîrsin ku piştî vekişandina hêzên Hevkar, qirkirinek din çêbibe. Hun dixwazin hêzên Hevkar li Kurdistanê binîn?

-Hêzên Hevkar dema ku ketin nav Kurdistana Iraqê bi me neşewirîn. Armanca xwe ya esasî ji me re negotin. Nuha diçin, dîsa ji neşewirîn. Belkî jî armanca wan,

ji bo vegeerê baweriyê bidin însanan, wan li malên wan bi cî bikin, ji bo demek kin şiddeta Seddam bisekinînin, xelkê ji mirinê bifiliînin.

-Hêzên emperyalîst gava mefeeta wan tê de tune be, ji bo mafên însanî be jî nakevin welatekî. Hun dikarin bibêjin ku Amerîka ji bo armançên însanî ketiye Iraqê?

-Bila viya Sovyet bibêje. Kî Kurdan bikuje ji bo min emperyalîst ew e.

-Bi ya we Amerîka çima alîkariya Kurdan nekir?

-Bi ya min Amerîkayê nexwest Kurd qezenc bikin, ji bo wê Seddam bû berdêla hukumetê şî, îslamî. Nexwest Kurd jî bîn ser hukum. Çimkî siyaseta Amerîka ya Rojhilata Navîn ne bi serwebûna Kurdan re ye.

-Çin, Sovyet û Kubayê nexwestin ku li di lehê Kurdan de biryar bê girtin. Neteweyên Yekbûyî qerarê di lehê Kurdan de bigre. Gotin alîkariya Kurdan mekin, ev karê hundurî ye Iraqê ye. Siyaseta wan welatan hun çawa dibînin?

-Îro "Kurdistanên" welatên sosyalîst jî hene, "Kurdistanên" gelek welatên kapitalîst jî hene. Ew dibêjin ku gava Kurdistana Iraqê bigihîje serwebûna xwe, wê dor were me jî, lewma jî naxwazin.

-Gava serhildayê dest pê kir di nav çend rojan de we gelek bajar girtin. Dûre jî bi carekê ve hûn têk çûn. Hûn vê yekê çawa îzah dikin?

-Her tişt bi lez û bez çêbû. Pêşmerge bajarek digirtin û derbasî bajarekî din dibûn. Lê li ku dera dunyayê dibe bila bibe, gava serhildan destpêdike yan meriv bi ser dikeve, ya jî wenda dike.

-Hin hêz dibêjin ku piştî têkçûnê, pêşmerge ji tirsê ruhê xwe bi alî sînoren Tirkîyê ve revîyane. Tu ji vê îddîyayê re çi dibêji?

-Na, ev ne rast e. Me bajar terk kirin. Hin pêşmerge zarok û jin birin ciyên hin bi emniyettir. Lê hemû pêşmerge di heremên xwe de şer dikirin. Vî şerî heta destpêkirina guftûgoyên bi Seddam re jî dom kir.

-Gel dibêje êdî mirin jî hebe, em hewêrd û warên xwe terk dikin. Tu çi dibêji?

-Ez ne bi vê dîtîne re me. Ev, girêdayî şerta ye. Çimkî gava Iraqê Dihok bomebaran kir, ez li wir



Samî Abdurrehman: Kî Kurdan bikuje ji bo min emperyalîst ew e. (Foto: Armanç)

bûm. Her der gullebaran kirin. Heta sibê wê bombardimanê dom kir. Gava bû sibê, her kesî zarokên xwe girt û revîyan. Hemû gundên me wêran bûbûn. Wê gavê kî dikare bibêje merevin. Lê em hêzên pêşmerge narevîyan, me şerê xwe domand.

Ez dikarim bibêjim ku di dema Barzanî de jî hewqas bajar û herem neketibûn destên me. Bajaren wek Şeqlawa, Rewanduz û hin heremên din îro di destê me de ne.

-Piştî ku meriv nikare baweriyê bi sozên Seddam bîne. Wê gavê dimîne li ser hêza we. Di şertekî xerab de hunê karibin li seranserî Kurdistanê cardin piştgirîya gel bistînin?

-Bi ya min hêza me bi xwe tenê pîr ne muhîm e. Divê du tiştî hev re hebin. Yek, divê hêza te tîr bike. Du, divê piştgirî te hebin. Heger li dunyayê piştgirî me hebûna nuha wê dewleteke me jî hebûya.

Gelî Musulmanan Musulmantiya we li ku ma?

Musulmantî ne tenê limêj, rojî, hec, zekat û kelfîma şehadetê ye. Bi kirina van her pênc tiştan, meriv Musulmanekî rût tê hisabkirin. Eyni mîna dareke hişk a bê fêki be. Îbadet, tiştêkî di navbera meriv û Xwedê de ye. Eger meriv bike, ji xwe re dike. Eger meriv neke, xusarê li şexsê xwe dike. Ya herî girîng, divê ku meriv di ray û tevdira dinyayê de bi qencî, mirovatî û wekhevîtiyê bilîpîke. Hema mînakê jî Noşîrevanê Adil e, ku bi xwe merivekî kafir bû û dê biketa dojehê, lê Xwedê ew neşewitand û jê re baxçeyekî mîna yê bihiştê çêkir.

Wek ku Hedîs û Ayet dibêjin; bingeha Îslamê li ser wekhevî, biratî û rastîyê ava bûye. Ayeteke Qur'anê dibêje: "Kesê ku zulmê dike, bila cihê xwe di nava êgir de bibîne." Yeka din jî dibêje: "Nebin terefdarê zaliman, hûnê jî di êgir de biqimirin. Hedîseke din jî dibêje: "Çaxê te xirabiyek dît, bi destên xwe paqij bike. Eger tu nikaribî, bi xebardana xwe li hember derkeve. Eger tu wê jî nikaribî, bi dilê xwe jê aciz bibe. Lê ev dilacizkirin, xwediyê îmana zeîf e."

Gelek mîletên Musulman hene; Ereban, Faris, Tirk, Efganî, Pakistânî, Kurd, Hebeşî û hwd. Her mîletêkî jî van, xeynî Kurdan, dewleta xwe çêkirîye û qedera xwe bi destên xwe didêre. Ereban, nêzî 20 dewletî çêkirine. Yanî her bavîkek yan eşîreke Ereban, bûye dewleteke bi serê xwe.

Lê belê Kurdistana di nava çar dewletên Musulman de hatiye parvekirin. Van Musulmanan hemû heyînen Kurdî yê pîroz ji holê rakirine, zîman, çand, folklor, tore û hwd li Kurdan qedexekirine. Ji bo kuştin û zîndankirina Kurdan bi hevdu re ketine sîqalê û tiştên bi sosret bi serên wan fînin. Ev 70 sal in roja ku Kurd bi destên leşker û polisên Tirk û Ereban û Farisan nêne kuştin, tune. Çaxê ku Tirk dest bi kuştina Kurdan dikin, Kurd ji hewle rihê xwe direvin û diçin xwe davêjin bextê Iraniyan, çaxê Faris wan dikujin, xwe davêjin bextê Iraqîyan, çaxa ku Ereban wan dikujin, vêca direvin diçin xwe davêjin bextê Tirkan.

Di van deh salên dawiyê de, rejîma Iraqê her

çiqasî Kurd dikuştin jî, gelek heremên Başûrê Kurdistanê bi jehrê bombebaran dikirin jî kesî pîr guh nedidayê. Lê Iraq bi vê yekê jî tîr nebû. Berî Newroza 1988 an, di 16 ê Adarê de bajarê Helebçê bi derbekê li Kurdan kir goristan û 3800 gundên wan wêran kirin.

Îro jî, nêzî sê milyonî Kurd ji ber xwînrejiya Seddam reviyane û ketine şikeft û qewereyên çiyayên bilind. Tev bê nan, bê av û bê sitar xwe di çelşên zinaran de vedîşerin. Herweha çewa ku em ji radyoyan dibihîzin û bi çavên xwe di televîzyonan de dibînin, her roj ji birçîbûnê du hezar Kurd dimirin. Û perîşanî û belengaziya kesên sax jî, ji mirinê zortir bûye.

Bi rastî tiştê herî ku bala meriv dikşîne bîdengmana Musulmanan li hember zulma Seddam e! Piştî qetlîama Helebçê bi heftiyekê, piraniya dewletên Musulman li Kuweytê civiyan û Konferansa Îslamê çêkirin. Di wê konferansê de hîç behsa qetlîama Helebçê û wêrankirina 3800 gundên Kurdan û kuştina bi hezaran Kurd nehate kirin. Lê ji xeynî Kurdan, behsa herkesî, heta ya Tirkên li Balkan û bi taybetî li Bulgaristanê jî hate kirin!

Îro li ser hemû misilmanan çî Ereban, çî Faris, çî Tirk û çî mîletên din wacib e ku alîkariya Kurdên belengaz bikin. Ev wacibat ne ku "ferzûkîfayet" e, herweha "ferzû'eyn" e. Li gor wacibatên Îslamî, divê ku her kes bi şexsê xwe alîkariya Kurdan bike. Berî Musulmanan, çî dewlet çî jî ferd Filehan alîkarî kirin! Îcar di şûna ku pêşî Musulman alîkariya Kurdên mezlûm bikin, umeta Îsa xwe gihande Kurdan nan, av û gelek tiştên din dan wan. Hedîseke Pêxember a din jî weha dibêje: "Qencê însanan ew e, yê ku feydê bide însanan".

Ez bi xeysetê meleyekî Kurd, ji hemû kesên Musulman û yê dîndar wê yekê dipirsim: Bi bîdengîya li hember wê rewşa xirab a ku Kurd tê de dijîn, Musulmantî li kû ma, dîn û îman bi kû de çûn?

Mele Evdîlcebar

DEWLETA KURD KABÛSA GELEKAN E

Zinarê Xamo

Gava Tirkîye, Sûriye û Îran ji bo ku Kurd li Kurdistanê Iraqê tu mafekî xwe yê netewî bi dest nexin dixebitin, bê guman ne tiştêkî pîrr xerîb e, tu siyasîyekî Kurd jî bi vê yekê şaş namîne. Lewma jî di qiriza Xelîcê de tiştê balkêş jî siyaseta van her sê dewletan bêtir, siyaseta hêzên çep, xwedêgiravî hêzên "antî emperyalîst" e.

Gelek kes û hêzên ku xwe sosyalîst dihesibînin "alîkariya" nanekî somînî, şûşeyek av û çadireke eskerî jî Kurdan re pîrr dibînin; dibêjin "ji bo kesên sarî meselê dinêrîna îqna bikin, koça Kurdan gêrî ser Tirkîyê kirin." (D. Perinçek, 2000'e Doçru, 21.5.91).

Yanî ev feleketa mezîna, perîşaniya 2-3 milyon insan wek sanaryoya filmekî ku ji alî Amerîka ve hatibe hazîrkirin mutaala dikin.

Hinekên din jî dibêjin, "emperyalîzm dixwaze Serresê jî gorê rake", "herêma tampon wê bibe dewleta Kurdan a embîryon û ewê jî di rojên pêş de bibe dewleteke serbixwe" û hwd.

Wer xuyaye ku dewleteke Kurdan a serbixwe, ne kabûsê burjuwazîyê Tirk tenê ye, her wisa ew ya çepê Tirk

e jî. Îcar heta ji wan tê bila ew, vê şovenîya xwe bi teorîyên "antî emperyalîstî"yê bincil bikin û terminolojîyê çep bi kar binin, cardin pere nake. Numûneyên jêrîna tîrsa di dilê wan de baş diyar dike:

"Piştî ku leşkerên DYA tîkevin Dihokê, operasyona parastîna multecîyan dikare vegere îşxala beşekî Bakurê Iraqê û veqetandîna ji welêt." (Ergun Balci, 8.5.91, Cumhuriyet).

"Herêma tampon a ku DYA li Bakurê Iraqê ava dike bi ihtimaleke mezîna sibe wê bibe dendîka dewleta Kurd a quçla." (Ferit İlsever, serokê Partîya Sosyalîst, İkbîne Doçru, 21.4.91).

Gelek eşkere ye, ev kes naxwazîna ku Kurd li perçeyekî din jî rizgar bibin. Perinçek û yê wê wî dîtîrsin ku di vî kirîza Xelîcê de Kurd jî bigihîjin hin mafên xwe yê netewî. Ji bo ku ew jî li gor qaweta xwe rê li ber vî yekê bigrin, her babet riyakarî û demagojîyê jî xwe re mubah dibînin. Armanca esasî: bira Kurd li tu perçeyî rizgar nebin, tim kole û bîndest bimînin. Di vî nuxte de rast û çepên Tirk (çend îstisna ne tê de)

digihîjin hev; ne cudatîyên sinîfî û îdeolojîk û ne jî hebûna dijayetîyên siyasî, rê li ber vî yekîtiya wan nagrin.

BÊBEXTIYA HIŞK Û BIRING

Uğur Mumcu, bê fedî û bê heya dibêje: "Di mesela Kurd de em dikevin demeke pîrr tahlûke. Di vî qonaxê de aksiyona Kurdî ya bi piştgiyaya Xerbê dixuliqe."

Îro li pişt plana "dewleta Kurd a azad" DAY û İngilîstan hene. Ji ber vî yekê jî qerekerêkî rasyonelîzma Kurdî ya "antî Amerîkan", "antî emperyalîst" û "antî kapitalîst" tuneye. (U. Mumcu, Hürriyet, 22.4.91)

Derewa ku "li pişt plana dewleta Kurd DYA û İngilîstan hene" li alîkî, lê yekî Mumcu efendî nas nake wê bibêje viya xelîfî Marks e. Dewleta Tirk li Rojhilata Navîn şargeheke NATO û mutte-fîkê emperyalîzmê ye. Mumcu efendî jî her roj amîgotîya vî dewletê dike; lê qet rojêkî jî xwe jî vî hevalbendîyê acîz nekiriye. Ew antî Amerîkan, antî emperyalîst û antî kapîtalîstîya jî Kurdan dixwaze, ji xwe û jî dewleta xwe nax-

waze. Bê guman Mumcu û kesên wek wî, baş dizanîna ku ne DYA û ne jî dewleteke Ewrûpî ya din jî bo avakirina dewletekê alîkariya Kurdan nekirine û nakin. Xwezî bikirana. Çaxa meriv di nav tîmsehan de bijî, divê meriv bi şeytên re jî hevkarîyê bike. Lê şeytan bi me re nake. Dewletên Kurdistan îşxal kirine û menfeetên wan ên herêmê jî wan re hîn muhîmtir in. Vê rastîyê her kes dizane.

Me gişan bi çavên serê xwe dît, Amerîka li Etîyopyayê çawa hukûmet xist û çawa muxalefet bi destên xwe anî ser hukûm. Li Polonyayê û li welatên Ewrûpa Rojava yê din emperyalîzmê bi xurtî alîkariya hêzên muhafezekar û kevneperest kir û di ketîna van rejîman gişan de roleke girîng list. Yê wî ku Kurdan bi hevalbendîya emperyalîzmê îtham dikin, qet rojêkî li dijî piştgiyaya emperyalîzmê ya bi Walesa re derneketin. Perinçek û yê wî wî jî vî alîkariya emperyalîzmê re çepik lêxistin. Û qaşo van welatana sosyalîst bûn jî.

Numûne pîrr in. Ma yê piştgiyaya paşverûyên Afganî dikin kî ne? Ma ne Amerîka ye; emperyalîzm e? (Bêguman Çîn jî heye). Ev hêzên îro xwe pîrr "antî emperyalîst" nîşan didin, ma kînga li dijî vî alîkariya emperyalîzmê derketin û gotin, wele emperyalîzm dixwaze bi rîya hêzên Îslamî li herêmê bi cî bibe?

Gava Amerîka û Xerb jî bo çareserkirina gelşa Fi-

listîn dixebitin û zorê didin hukûmeta Îsraîl, ma kes li dijî derdikeve? Ya jî Filistinîyan bi hevalbendîya "emperyalîzmê" îtham dike? Ji bo stendina piştgiyaya Amerîka û ya Xerbê, ma Arafat bi şev û roj naxebite? Bê guman dixebite û rast û çepên Tirk giş bi hev re jê re dibêjin "her bijî!" Dibêjin her bijî, çimkî her kesê baqîl dizane ku ancax van hêzên mezîna ku îro ew xwedîyê dinyayê ne, dikarin di helkirina gelşê de rolekê bilîzin. Îcar gava kurdek bi parlamenter, ya jî bi humanîsteki Ewrûpî re rûdine, fena ku zînyayê bi diya xwe bike, qiyamet radibe, em dibin "hevalbendên emperyalîzmê" û hwd.

Hinek "çepên" pîrr baqîltir hene, ku dibêjin avabûna dewleteke Kurd wê hebûna Tirkîyê, Sûriyê, Iraqê û Îranê tîxe tahlûkê.

"Herêma Kurd a ku wê jî alî Xerbê ve li Iraqê bê avakirin, ne tenê li dijî Iraqê, li dijî Sûriyê, Îranê û hetta li hember Tirkîyê jî, gava hewce be wê karibe bibe unsurê qozeke politîk." (Murat Yetkin, Demokrat, hej.: 12)

Camêr tu nemaye bibêje heger dewleteke Kurd wê dawîya dunyayê bê.

Di kirîza Xelîcê de tahlîlên weha "yaman" bê şik divê gelek tiştî fêrî me Kurdan bike. Çimkî bela sebeb negotîne, dost jî dijmin jî di rojên teng de xuya dibin.

Ma Sêvres wê "ji gorê rabe?"

Li gor hin "munewerên" ku tahlîlên xwe li ser "teorîyên komployê" inşâ dikin, rewşa nuha ya tevayî di vî îstîqametê de ye.

Çimkî li gor wan, li pişt "herêmên tampon" ên ku li "Bakurê Iraqê" ava dibin, emperyalîzm heye.

Armanca esasî bi şiklekî ku Bakurê Rojhilat jî bigre nav xwe, li herêmê avakirina dewleteke Kurd e.

Bi vî awayî jî wê Cumhuriyeta Tirkîyê perçe bibe.

Bi vî rengî, Peymana Sêvresê ya ku di 10'ê Tebaxa 1920'a de hatibû îmzekirin û dest dabû ser erdê împaratoriya Osmanî, wê "ji gorê bête rakirin".

Herwiha "Duvel-i Muazza-ma" ya ku piştî Şerê Cihanê yê Yekem ava bû, wê bi pusûleyeke nuh, "emela xwe ya menfû" bi cî bîne.

Tu bîngeheke objektîv ya vî tezê tuneye. senaryoyeke xerîb e. Nukskirina paranoayên kevin e. Çimkî, înkîşai di vî îstîqametê de ye.

YEK: Di tîkîlyên navnetewî

de, sînorên welatan herb ne tê de, nadîren tînan guherandin. Daxwaza perçekirina yekîtiya erdê, di lîsanê dîplomatîk de, "casus belli" ye. Bi gotîneke din, her daxwazêkî li ser sînorên bi peymanan hatîne danîn, jî alî dewletan ve wek sebebê herbê tê îdrakirin.

Destlênedana sînoran jî "statukoya meşrû" tê hesibandin.

DU: "Daîmîya statukoyê" konjoktora navnetewî ya îro jî tayîn dike. Di serî de Amerîka û Sovyet, li rûyê dinyayê hemû hêzên mezîna û yê navîn, bi siyaseta parastîna yekîtiya axa welatan re ne.

Li qîta Afrîka ku sînorên wê gelekî nuh û elastîkî ne, lê cardin jî meyla "parastîna statukoyê" di giraniyê de ye. Siyaseta Amerîka ya dawî ku naxwaze Eritre ji Hebesîstanê veqete, numûna vî ya herî aktuel e.

SÊ: Îddîaya ku dibêje "herêmên tampon" yê li Bakurê Iraqê, wê jî dewleteke Kurdî a serbixwe re bibin bîngeh, ne rast e. Herêmên ku qala wan dibê jî zarûriyeteke insanî; jî

bona ku heta dereceyêkê eşa gelê Kurd kêmbibe, peyda bûne. Amerîka bi zora Tirkîyê û Yekîtiya Ewrûpayê "kerhen", bêyî dilê xwe razî vî teşebûsê bû. Di navbera emperyalîstan de jî bo xapandîna xelkê şerekî bi plan, bi sanaryo tuneye.

ÇAR: Amerîka û Yekîtiya Ewrûpayê, Kurdistanê serbixwe naxwazîna. Ev pozîsyon, di dema kirîza Xelîcê de bi şiklekî eşkere jî serokên Kurdên Iraqî re hate diyarkirin. Jixwe, Barzanî û Talabânî jî dan xuyakirin ku daxwaza serxwebûnê ne realist e. Faktora bîngehîna a vî siyaseta Amerîka û Yekîtiya Ewrûpayê, pozîsyona Tirkîyê, Îran, Iraq û Sûriyê ye. Çimkî her çar welat jî wê Kurdistanê serbixwe wek sedemê şer yê guherandîna statukoya sînoran (casus belli) bihesibînin.

Teoriya komployê

Hadi Uluengin

Di rewşek wiha de jî, ji coxrafîya siyasî ya mewcûd re bi zor empozekirina dewleteke Kurd, fikreke berradayî ye, li dijî aqil û rastîyê ye.

PÊNC: Niyeteke Amerîka Yekbûyî û Ewrûpa ku Tirkîyê "perçe bikin" yan jî jî hêz bixînin tuneye. Siyaseteke dewletî ya bi vî rengî tuneye. Îddaayên wiha xwe naspêrin tu bîngehên maddî. Menfeetên Rojava yê giştî, di gel Tirkîyeye ku bibe faktora îstîqrarê, xurt û nezî Rojava, li hev dikin.

Di vî çarçewê de, gotinên dawî yê Wezîrê Derve yê Hollandayê, ku wê jî meha Temûzê û pê ve serokatiya Yekîtiya Ewrûpayê bike, dîtina Rojava ya di derheqê Anqerê de xulasa dike. Xulase, formul; Tirkîyeye hîn xurt, lê hîn azad û hîn demokratîktir e.

Lewra jî li gor gotin û delî-

lên forumên wek parlamentoya Ewrûpayê û Konseya Ewrûpayê, yê wî mesûliyet û bê qîmet, qala "teorîyên komployan" kirin, tehrîfata rastîyê ye.

Sêvres "wê jî gorrê ranebe". Di vî îstîqametê de daxwazîyeyeke siyasî tuneye.

Jê wêdetir, dunya guherîye. Lê ji bo ku Tirkîyê bi dunya guherî re hîn bêtir bibe yek, mecbûr e ku xwe biguherîne.

Mesela Kurd jî ku di esasê xwe de meseleyeke demokrasiyê ye, ew jî daxil e.

Tiştê din ê ku dibê bê guhertin, sistematîkên fikrî yê "xeyale" in ku hebûna xwe bi "teorîyên komployan" ve girêdane.

Not: Me ev nivîs jî rojnama "Hurriyet" (07. 06. 1991) girtiye.

Lêkolîn

ZIMANÊ KURDÎ YÊ LÎTERATURÎ;

Asteng û Problem

Bavê Nazê

Dibêjin ku ciyê du Kurd lê bicivin, wê qala sîyasetê bibe. De em çawa bikin, qey qedera me weha ye: heya ku em mafên xwe bi dest nexin, sîyaset wê ji bo me her karê rojane be.

Li gel ku babetê vê nivîsê ne babetekî sîyasî ye jî, lê ez dê nikaribim bêyî vê yekê derbasî tema xwe bibim. Ma wê çilo di warê zimanê Kurdî de qala sîyasetê nebe, gava elfabeya zimanê me mîna belavokeke sîyasî qedexa be û kesê ku li mala wî ev tişt bê dîtin, bê girtin û ceza kirin!

Bi xwe eger em di nav komeke zimannasan de bibêjin ku zimanê me resmîyên qedexa ye û zimanê me yê lîteraturî heye, ewê bi çavên matmayî li me binêrin û bipirsin: Çima?

Bi rastî jî çilo? Ma gelo emê bikaribin bersivê bidin û bibêjin ku zimanê me yê lîteraturî heye? Gelek caran Kurd ji dîlpaqîya xwe dibêjin: erê heye û ku dewleta me çêbibe, ewê zimanekî yekbûyî yê Kurdî jî çê bibe.

Bê guman di rûniştina zimanê lîteraturî de hebûna dewletê roleke mezin dilîze. Lê belê eger bi tenê ev faktor bûya, hingê wê miletê rûs negota; zimanê me yê lîteraturî jî Pûşkîn dest pê dike. Mane em pê dizanin ku hingê jî Rûsya wekî niha ji dewletên mezin dihat hesibandin. Her wiha em pê dizanin, ku gelek milet di dîroka xwe de xwedî dewlet bûn, lê zimanê wan yê lîteraturî zimanê gelên din bûn. Li herêma me em dizanin ku heya demeke dirêj zimanê lîteraturî Farisî, Romanî û Erebi bû.

Eger weha be, gelo xesletên zimanê lîteraturî çî ne? Eger em çavên xwe li ferhenga edebî bigerin, emê li ser zimanê lîteraturî van hevokan bixwînin: "Zimanê lîteraturî çî bi nivîskî, çî bi devkî, formeke cîgirtî ye ku di hemû waran de di xizmeta civakê de ye. Ew navgîna pêşketina mileta ye. Ew normek giştî ye, ji bo danûstandin û jî hev famkirinê."

Bi xwe du formên zimanê lîteraturî hejê ku ew jî di warê nivîsandin û axaftinê de xuya dibin. Ji ber vê yekê nabe ku em bibêjin, zimanê lîteraturî yê nivîsandinê û zimanê devkî jî yê axaftinê ye. Çimkî axaftina kesên sîyasî û zanyaran ji zimanê lîteraturî tê hesibandin. Di vir de em dikarin bibêjin ku du zimanên axaftinê hene; yek devokî ye û yê din edebî ye.

Zimannas bi awayine cihê zimanê lîteraturî didin nasîn. Hin dibêjin ku ew zimanê gelêrî ye û jî aliyê nivîskaran ve hatiye paqîjkirin û şayik bûye. (Bi taybetî ev dîtin ji bo zimanê ku edeba wî pêşde çûye, tê gotin.) Û Hinekên din zimanê lîteraturî bi tenê dispêrin zimanê pirtûkan. Lê li ser zimanê edebî çî nêrin bîn pêşkêş kirin, tişteke heye ku nabe em ji ber çavan bidin alîkî. Ew jî ev e ku zimanê lîteraturî navgîn û rîya jiyana civakî, maddî û giyanî ya gela ye. Zimanê lîteraturî karekî civakî û komaleyê ye. Ew di des-

tê gelan de çeka parastina çand û hewîya netewî ye. Lê mixabin ew rewîstên ku ji bo zimanekî lîteraturî pêwîst in, di zimanê me de peyda nabin. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin ku zimanê Kurdî yê lîteraturî, yê cîgirtî heye. Lê ev nayê wê ma'nê jî ku di wî warî de em ji sifirê dest pê dikin.

Di vir de pêwîst e bête gotin ku mebesta min li ser zaravê Kurmançiya jorî ye. Çimkî zaravê Kurmançiya xwarê ji mêj ve formeke standard standiyê û ber bi cîgirtinê ve çûye.

Hinek dikarin bibêjin: "Jixwe dijminên Kurdan dibêjin ku zaravên zimanê Kurdî, ne zarav in, lê zimanên cihê û serbixwe ne û ew nabin yek ziman." Ev babetek taybetî ye û li vir emê li ser ranewestînin. Helbet herçî em Kurd, em dizanin ka mebesta dijmin jî vê yekê çî ye: Ew dixwazin bi vê yekê bibêjin ku: "zaravên we durrî hev in û

Zimanê lîteraturî karekî civakî û komaleyê ye. Ew di destê gelan de çeka parastina çand û hewîya netewî ye. Lê mixabin ew rewîstên ji bo zimanekî lîteraturî pêwîst in, di zimanê me de peyda nabin. Ji ber vê yekê em nikarin bibêjin ku zimanê Kurdî yê lîteraturî, yê cîgirtî heye.

hûn jî hev fam nakin, me'na xwe hûn ne yek milet in." Lê tê zanîn ku gelek miletên wek me hene ku xwediyên gelek zaravan in û kes şik û gumanan nayine ser yekitiya miletbûna wan. Bêyî ku em gotinê dirêj bikin, dikarin bibêjin ku îddiyên dijminan ên li ser zimanê me, bê bingeh in û ne ilmî ne.

Wekî nas e, zimanê lîteraturî nikare çêbibe û ciyê xwe bigire, eger sê himên bingehîn jê re peyda nebin ku ew jî ev in:

- 1- Elfabe û rastnivîsandineke standard
- 2- Ferheng
- 3- Gramer

Bi bawerîya min wê bê wicdanî be, eger em di warê avakirina her sê himên zimanê lîteraturî yê Kurdî de qala rola Celadet Bedirxan nekin. Ezê nikaribim teheyul bikim ku wê niha rewşa zimanê me çawa bûya, eger xebata Mîrê me neba! Em pê dizanin ku Celadet Bedirxan li ser bingehê tîpên Latîni, elfabeya Kurdî jî 31 fonêman çêkir. Li gel ku elfabeya wî ji bo zimanê me ya herî munasib e, lê mixabin heya niha jî çî ji hoyên objektîf, çî ji yê subjektîf, ew nebûye elfabeya hemû zaravên Kurdî. Mîr Celadet baş fam dikir ku piştî dayîna tîpan, di çarçewa ferhengê de berhevkirina gotinan, gava duyem e. Her weha wî baş dizanibû ku qelsî û xurtbûna zimanê ma jî çî tê. Û li gor Mîrê me: Zimanê me îro hem fireh û hem teng e. Zimanê me fireh e: her tiştê ku Kurd pê

mijûl bûne, dest dane wan. Celadet Bedirxan dibêje ku di wî warî de zimanê me li ber zimanên gelên din bi şûnde maye. Zimanê me teng e, "her çî ji Kurdan re nenas mane û Kurd pê mijûl nebûne." Di wî warî de zimanê me rawestiyaye û bi pêş de neçûye.

Li gor Celadet Bedirxan, bêjeyên zimanê me jî ber du sedeman kêmtir dibin:

- 1- Windabûna bêjeyan
- 2- Ketina bêjeyên biyanî nav zimanê me

Ji ber vê yekê êdî Celadet Bedirxan mijûlî berhevkirina bêjeyên kurdî dibe û di warê morfolojî de ew bixwe dest bi çêkirina gotinan dike. Lewra jî di hin hejmarên "Hawar"ê de ferhengokê hebû.

Roja îro nêrînek li ba Kurdan heye, ku hema em di şûna peyvên biyanî de, yê Kurdî, çî nuhçêkirî û çî jî zaravên din, bigrin ku zimanê xwe yê lîteraturî çêkin. Lê mixabin ev makenîzma han nikare ji bo damezirandina zimanekî lîteraturî, yê yekbûyî, bibe alîkar. Berevajî, heta derecekê ew dikare ziyane bigihîne wî. Çimkî avakirina bêjeyan karê dezgeheke ilmî ye û kesên ku pê radibin, divê alim bin...

Herçî Celadet Bedirxan, li gel ku dezgehek li pey nebû, lê bingeh û zanabûna wî ya ilmî rê dida ku ew bi vî karî rabe. Ma ne Celadet Bedirxan bi serê xwe med-reseyek bû. Gelo roja îro, yekî wek Mîrê me di nav me de heye, ku bi tena xwe bi vê rolê rabe? Mixabin ez dikarim di cî de bibêjim "na". Ji ber vê çendê kesê ku vî mafî bide xwe, ew gunehkariyê di derheqê zimanê me de dike.

Û di pîrsa gramera Kurdî de jî, em deyndarê Celadet Bedirxan in. Lê heyf mirina berî wextê nehişt Mîrê me di wî warî de her tiştê xwe bibêje. Lêbelê, babetên ku ew gi-hayê ku li ser binivîse, wê kek bingehê gramera Kurdî bimînin. Hin dikarin li ser gramera Qanatê Kurdo û ya Reşîdê Kurd bipirsin? Mîrov nikare xebatên wan zanayên me kêmtir bibîne, lê eger rastî bê gotin, divê em bibêjin ku Celadet Bedirxan muessis e û lêkolînê wî xwerû jî zikê zimanê me derketine.

Celadet tu caran xusûsiyeta zimanê biyanî nekir werger û derbasî zimanê me nekir. Herçî xebatên Reşîdê Kurd û Qanatê Kurdo: ew di bin tesîra zimanên Erebi û Rûsî de hatine nivîsandin. Lê ev nayê wê ma'nê ku van camêran tişteki nuh li gramera me zêde nekirine. Li vir ez dikarim bibêjim ku beşa morfolojî jî gramera Qanatê Kurdo pir buhagiran e. Her weha hin termên gramêrî ên Reşîdê Kurd di ciyên xwe de ne û pêwîst in ku ew bimînin.

Ji tecrubên miletên din, em pê dizanin ku hebûna elfabe, gramêr û ferhengê nayê wê manê ku pêre pêre wê zimanê lîteraturî çê bibe û ciyê xwe bigre. Na, bi her sê faktorên zimanê edebî nayê meydane. Ew bi tenê jî bo pêşketina ziman dibin bingeh û gavên pêşîn. Eger em bixwazin zimanê me yê lîtera-

turî hebe û pêşde here, pêwîst e em bidin ser du rîyan; rîya wergerê (wergera edeba klasîkên cihanê) û rîya afirandina bi zimanê Kurdî (bi taybetî di warê çîrok û romanên de).

Li gor agahdariya min, di heya-ma me de sê berhem jî edeba ci-hanê tercûmeyî Kurdî bûne; romana James Oldirige "Çiya û Çek", "Çî-rokên Bijarte" yê Çexov û "Keça Kapîtan" ya Pûşkîn. Berhema pêşî jî orîjîna wê, ji îngilîzî hatiye wergerandin, lê yê din jî zimanê sisîyan, ji Tirkî bûne Kurdî. Romana Oldirige bi tîpên Erebi belav bûye, lê belê ya Çexov û Pûşkîn bi tîpên Latîni ne. Ji ber ku jî her sê wergeran bi tenê "Keça Kapîtan" li ber destên min heye, ezê li ser wê rawestim û nêrîna xwe li ser bibêjim.

Berî her tiştî pêwîst e bê gotin ku xebata van camêran, xebatek dijwar û çetin e û pir pîroz e. Di zeviya beyar de ew gava pêşî davêjin. Gavavêtina pêşî her tim zehmet e û ne bê şaşî ye. Bi xwe ez dikarim texmîn bikim ka çiqas asteng di karê wergerê de ketine pêşîya van hevalan. Lê tevî vî jî xwe nedane paş û xebata xwe birine serî. Bi ya min, hevalên ku Çexov û Pûşkîn wergerandine, berî ku

pirtûkên xwe bidan çapê, diviyabû ji bo kontrolê bidana hin zimanna-sên me. Lê mixabin ev tişt nebûye û ev yek bûye sedem ku hin şaşî-yên bi rehetî rast dibûn, di tekstê de bimînin û kêmasiyên wergerê pirtir bibin. Bivê nevê; bi kêma-siyên pirtir belavkirina pirtû-kekê gunehkariyeka mezin û giran e.

Gelo çima? Pêla mirov li herê-ma xwe bi devoka xwe dipeyive û di axaftina xwe de şaşîyan dike, şaşî di nav sînorên teng ên herê-ma wî de dimînin. Û rojek tê ku bi saya nivîsê û cîgirtina zimanê lîteraturî, ev kêmasiyên devokî di nav mîlet de kêmtir dibin. Lê belê ku devokek tevî şaşîyan xwe bikeve ser rûpelên pirtûkan û belav bibe, îca ew jî sînorê herêmê dertê û di-kare ziyaneke mezin bigihîne wî zimanê lîteraturî ku hîn di qonaxa xwe ya pêşî de ye. Ji ber vî çendê, pêwîst e ku nivîskar û wergerên me berî ku pirtûkên xwe bidin çapê, zimanê pirtûkan jî aliyê kesên din ve bê kontrol kirin. Di vir de ez xwe gunehkar dibînim û nivîsên xwe yê belavbûyî ji van gunehan naşom ku fîrsetek bi destê min keve, ezê wan bidim ber meqes û bi zimanekî tekûztir çap bikim.

(Dom dike)

FEQ

Zeki Seyda

Îro feqek ji aliyê ronakbîr û siyasetvanê Tirkan ve li pêşîya gelê Kurd tê danîn. Pêwîst e siyasetvan û ronakbîrên Kurd li hember vî feqê jî hemû deman hêtir şiyar bin. Nekevin vî feqê. Dibêjin guya Amerîka û dewletên Ewropî dixwazin cardin Sewrê li dar xî, dewle-teke Kurd ava kin. Lewra divê em li hember "emperyalîzmê" bisekinin. Em rê nedîn vî tiştî. Ji ber vî yekê jî em li hember Kurdîstaneke serbixwe ne. Guya Kurdîstaneke serbixwe wê ji Amerîka û dewletên Ewropa re bibe maşê. Wê bibe Îsralla duduyan. Pir heyf e ku gelek siyasetvan û ronakbîrên Kurd jî bi van tiştan dixapin. Bi navê li dijîbûna "emperyalîzmê" jî wan re dibin alet.

Gere em baş zanibin ku ev çîrok ne nû ye. Bavê wan Mistefa Kemal jî bi van çîrokan em xapandin. Em hatin di vir re derketin. Îro dixwazin cardin vî çîroka kevin çîla bikin, bi navê çepî û sosyalîstiyê li dar xî. Me pê bixapînin, weke ku bi salan em pê xapandin. Lê ez di wê baweriyê de me ku siyasetvan û ronakbîrên Kurd êdî hişyar in û wê neyên xapandin.

Pir heyf e îro siyasetek Amerîka û dewletên Ewropî jî bo Kurdîstaneke serbixwe tune. Xwezî hebûya. Em ferz bikin ku bila siyasetek weha hebe. Berî her tiştî ev daxwazî heqê gelê Kurd e. Çima jî Tirkan re, Ereban re, Farisan re heqe e, jî Kurdan re ne heqe.

Ez hêvî dikim ku siyasetvan û ronakbîrên Kurdan bi van çîrokan neyên xapandin.

Niyeta Celal Talabani çî ye?

Celal Talabani dixwaze çî bike? Di her fîrsetê de pesnê Ozal dide. Dibêje Ozal qedexebûna li ser zimanê Kurdî rakirîye. Halbuki eynî Ozal berî çendekê li Parîsê li ser pîrsa parlamenterekî Ewropî weha got: "Em nafikirin ku otonomiyê bidin Kurdan. Ji ber ku Kurd li temamê Tirkiyê belav bûne û asimîle bûne". Gelo Celal vî nizane, ewqas pesnê Ozal dide.

Li gor rojnama "Hurriyet"ê Celal weha jî gotiye: "Ger bi qasî demokrasîya li Tirkiyê heye, li Iraqê jî demokrasî hebûya, me otonomî nedixwest, emê di hundurê parlamentoyê de bixebitîyana".

Gava meriv van gotinan dibihîze yan dixwîne, du tiştên bîra meriv. Xwediyê van gotina yan divê kor be, yan jî ji politîka Tirkiyê bêxeber be. Ez îhtimalê nadim ku Celal Talabani ji politîka Tirkiyê bê xeber be. Çimkî Celal Talabani serokekî Kurd e û tîkiliya wî bi hêzên Kurdîstana Tirkiyê re heye, informasyon distîne. Eger wisa be niyeta Celal Talabani çî ye? Dixwaze çî bike?

Min eleqedar nake, Celal otonomiyê dixwaze ya dev jê berdide. Ev, wî eleqedar dike, lê bi sedan siyasetvan û ronakbîrên Kurdîstana Tirkiyê hîn jî muhacir in, li gor Qanûna Esasî (anayasa) ya Tirkiyê avakirina partiya Kurdan qedexe ye. Bikaranîna zimanê Kurdî di warê resmî de qedexe ye. Kurd jî radyo û televîzyonê fêde nabînin. Zimanê Kurdî, çanda Kurdî qedexe ye. Nivîsandina bi zimanê Kurdî qedexe ye. Asimilasyonê nedîtî li ser Kurdan heye. Berê digotin Kurd tunene, Tirk in. A niha jî dibêjin asimîle bûne.

Wek Kurdekî ji Kurdîstana Tirkiyê, dibêjin ku tu heqê Celal tune ye ku rabe di civîna Enternasyonala Sosyalîst de, van gotina li ber temamê dinê bibêje. Bila Celal li karê xwe binêre, eleqa wî bi rîe tune ye. Piştî ku rewşa serokê Kurdan ev be, ma wê kî Kurdan cidan bigre û wê Kurd çî bi dest xî.

Mihemed Efi Huseynî:

"Hê helbesta ku ez dixwazim binivîsînim, min nenivîsandiye"

Mihemed Efi Huseynî di sala 1957'an de li bajarê Amûdê ji dayik bûye. Xwendina xwe ya destpêkê û lîsê li Amûdê temam kiriye. Di sala 1986'an de ji unîversîta Helebê diploma zîmanê Erebi girtiye. Ji sala 1980'î û vir de gelek helbest, gotar û lêkolînên wî di kovar û rojnameyên Erebi de hatine belavkirin.

Di sala 1990'î de li Swêdê kitêbeke wî û Ehmed Huseynî bi hev re bi navê "Mistek ji Şîna Bêcir" derket. Beşê M. Efi Huseynî bi Erebi û yê Ahmed Huseynî jî bi Kurdî bû.

Mihemed Efi Huseynî heta nûha bi Erebi nivîsandiye, lê hin helbestên wî jî alî Ehmed Huseynî ve bo Kurdî hatine wergerandin. Ew nûha hewl dide ku bi Kurdî binivîsîne û li ser destaneke dirêj dixebite.

M. Efi Huseynî ji sala 1990'î vir de li Swêdê dijî.

Li ser navê Armançê heval Zinarê Xamo ev hevpeyvîn pê re çêkir.

Armanç: Ew rewş û tiştên ku edebiyat bi te da hezkirin û tu kişandî nav refên wê çi bûn?

M. E. Huseynî: Ez bi xwe kurê malbateke edîb û dînî me. Bavê min şêx e, hozanekî zîman, fiqih û helbesta Erebi ye. Odeyek wî ya biçûk hebû, -û hê jî heye-hemû mirovên ku mijûlî edebiyatê dibûn, di wê ode de diciviyên. Ew ode bûbû cihê rewşenbîrên Amûdê. Li wir, li ser edebiyatê, fiqih û zîman munaqesê dikirin. Ji biçûkanî de ez diçûm wê ode, bi meraq min li qesîdên sofîyan guhdarî dikirin, Mele Ebdûlrehmanê Kurimî tê bîra min, mirovekî nivkor, lê hişê wî jîndar û xurt bû, dengê wî pir zelal û xweş bû. A nuha ez dengê wî di hisê xwe de vedigerînim, li çiyakî bilind li ber, dareke mezin a berûyê datînim. Li gel tiliyên şareza ên sofîyan ku li defê (erbanê) dixistin pesnê Xwedê, şêx û gelek tiştên balkêş, didan. Lê wê gavê min ew tişt nas nedikirin. Her weha li wir helbestên Cegerxwîn bi awakî feqetî û pir întresant dihatin, gotin.

Di helbesta Erebi de ku bavê min malikên wê bi min didan ezberkirin, bi taybetî jî helbestên **İbn El Farid û Mûtenebî**, tîna bîra min.

Amûdê û çarmedor û tesîra apê min yê di warê wergerandinê de şareza (ku wî, Şîvanê Kurd, Reşoyê Darê, Hêsir û Baran, Dîwana Cizîrî wergerandine) û nivîsarên wî yê helbesta komîdî pir tesîr li min kirin.

Şewata Amûdê û bexçê ku ji ber maye, heykelên şehîdên sînemê û bi sedan gorên şehîd û kulîlkên nûhatî û hişyariya ku zû bi zû li ser deng û basên şîne hat geşkirin, zîmanê Kurdî ku me nizanîbû zîmanekî serbixwe ye û dawîya dawî, komîkên edebî yê hevalên ku bi helbest û edebiyatê mijûl dibûn...

Di van asoyan de û ji pirtûkên bavê xwe yê ku roj bi roj kêmîr dibin -Ji ber ku di rojên teng de wan difroşe- ez nêzî edebiyatê bûme, yan jî hingivîme edebiyatê.

Wê gavê min gelekî xwend û min pir helbest ji ber kirin. Nuha min ew jî bir kirine, lê cih û war hin jî di wicdanê min de ne.

Di nêrîna te de pîvanên ku meriv bikaribe bibêje ev helbest e û ev jî ne helbest e, çi ne?

Di nêrîna min de ev in pîvanên helbesta Kurdî:

Helbest hetanî kîjan sînorî bi kevnoreya Kurdî ve girêdayî ye; wek, helbest, çîrok, serpêhatî, destan, şûnşopa Kurdî ya kevnar. Ka helbestvan hetanî kîjan derecê ev kevnore derbas kiriye û çi lê zêde kiriye. Bîna wê, rengên şîna û şadiya wê û giyana wê serdemê herdem daxwaza qalibên nuh dike. Yanî vegera li kevnoreyê, têrbûna jê û bi alavên nûjen derbasîkirina wê bi alî sînor û asoyan ve...

Xwîna Kurd a ku pirr tê rijandin û xwîna ku nû dibe. Mirovê Kurd bi zîmanekî nûjen derbasî esmanê vê sedsalîyê bûye, bi êşên mezin û bi şînyên dirêj. Mirovê helbestvan hetanî kîjan sînorî nêzîkî van tiştan hemûyan bûye...

Jiyana mirov ya rojane, kêlikên ku mirovek, yan em tê de dijîn. Wek nimûne: evîn. Ka yê helbestvan çi pêşkêşî min kiriye, gava ku ez di vê rewşê de jiyabim, an gava ku ez mirovekî evîndar bim. Ji bo tîkçûn û şikestin, bêhêvîti, xweşiyên piçûk ên jîna Kurd ku dema sînoran derbas dike, yan jî ji zaroka xwe re distirê, dilorîne, gava ku nan li tenûrê dixîne, gava di şevbûhêkan de çîrokên dayikan dibêje, dayikên ku birînen zilaman derman dikin. Helbestvan jî van tiştan çi dibêje û çawan tîne ser zimên? Helbestvan mîna her Kurdekî bi van tiştan tevan dihise û dijî... Ev giş û formeke pêşveçûyî bîyî kû mirov tekeve sergêjiyê, ji pîvanên ku ez bi wan bawer im.

Tu rola xeyalê di helbestê de çi qasî muhîm dibîni?

Belkî xeyal di helbesta Kurdî ya nûjen de ne nêrînek hu-

nermendî ya girîng be. Lê xeyal çi ye? Ew wêne û sembolên kevnar in ku daketine jiyana rojane, ya bi peyvên sivikgiran, an bi hêsanîya zor... Di nêrîna min de gerek helbest bi wêneyên nêzî jiyana Kurdan ya rojane mişt be. Bi awakî din gerek helbest maddî be, maddî be ku karibe cîhana manewî tevî ya hisî bike. Îcar helbest him jî xeyalê û him jî jiyana realist tê. Wekî ku Rîtsos dibêje.

Li gor te, helbesta xerab çi ye û tu dikarî wê çawa tarif bikî?

Helbesta xerab, helbesta ne qenc ew e, ku nêzîkî rewşa min î saykoloji nabe, nêzîkî haletên min î mirovî nabe -xewn, xwezî, evîn, şîna-, yan jî gava ku ez pê bihesim ku helbestvan ne rast dibêje û pêjnên min şiyar nake.

Xwendina helbestê wekî mirovê tî ye yê ku li avê digere û li kaniyekê rast tê; aveke xweş, zelal, şêrîn, bê guman wê ji aveke wiha gelekî vexwe û dibe ku çend zuxur jî derbasî zîkê wî bibin, lê pê nahise. Helbesta xerab jî wekî ava şêlû ye, wekî ava tal e. Zuxurên wê pirr in û ji bilî talîtiyê tiştek derbasî zîkê mirov nabe.

Tu, wek helbestvan bar û wezîfeyê milî û

Helbest ne tîng e. Di rewşa me ya îro de em gelek ferqê naxin navbera wan. Di gelek ciyan de peyv û dengê gullê tevlihev bûne. Gerek helbest nekeve golên îdeolojiya zuha. Gerek helbest ji siyasiyan re nebe paşmêr û bi dû biryarên siyasî baz nede û nebe zirneyeke tûj ji bo belavokên siyasî... Tu ferq di navbera helbestê û xwîna Kurdî de nîne. Lê, di navbera peyvên mirovê siyasî û mirovê helbestvan de sînorek heye.

mesûliyetê civakî didî ser milê helbesta xwe, yan na?

Helbest ne tîng e. Di rewşa me ya îro de em gelek ferqê naxin navbera wan. Di gelek ciyan de peyv û dengê gullê tevlihev bûne. Gerek helbest nekeve golên îdeolojiya zuha. Gerek helbest ji siyasiyan re nebe paşmêr û bi dû biryarên siyasî baz nede û nebe zirneyeke tûj ji bo belavokên siyasî... Tu ferq di navbera helbestê û xwîna Kurdî de nîne. Lê, di navbera peyvên mirovê siyasî û mirovê helbestvan de sînorek heye.

Ji alîkî din ve helbesta Kurdî, ji cîgehê xwe yê semîmî, ji "çîyan", ji dar, ji agir, ji çîrokên êvaran yê jînan, ji pevçûnên zarokan, ji peyvên evîne yê di navbera du evîndarên Kurd de çi pêşkêşî kiriye? Vî beşê veşartî yê ji jiyana civakî divê helbestvan ji

bîr neke û bi taybetî jî helbestvanê ku li dervayî welêt dijî. Pêwîst e wan cihên kevnar bîna bîra xwe û bêhna wan ji nû ve bide wan, ew bîna ku roj bi roj em wînda dikin...

Tesîra helbestvanên Kurd û yê biyanî li ser helbesta te çi ye û kê bêtir tesîr li te kiriye?

Belkî hişyariya helbestê ji zaroktiyê ve hatibe. Di zaroktiya xwe de ji çîrokên pîrka xwe tîr dibûm ku bîna zemîn, nan û şewatan jê ji cîhana wê dihat. Dûre min bi ramanên nû bi wan çîrokên re da û stend.

Bavê min carcaran helbestên Melayê Cizîrî ji bo min dixwendin û tesîra wan helbestan pirr li min hebû, bi taybetî jî ji hêla ramanên metafîzîkî û yê sofîtiyê ve ku nêzîkî tiştên maddî dibûn; wek lêvên yarê û bada meyê.

Min wexteke dirêj helbestên Erebi xwendibûn. Hemû babetên vê helbestê kê-m-zêde min xwendine û ji ber vê yekê tesîra helbestvanê Iraqî "Sedî Yûsif" û yê Sûrî "Nezîh Ebû Efeş" di helbesta min de ber bi çav e.

Ji helbesta dinyayê ya ku tercûmeyî zîmanê Erebi bûye û min xwendiyê, kêfa min bêtir ji helbestên Fîrensî re tê. Û belkî bi hindakayî tesîra Îlwar û San Con Bers di helbesta min de hebe.

lê ji hêsir û hisretê û ji bêrîkirinê ye jî.

Û bi taybetî jî bêrîkirinê. Belkî, ez bêriya tiştên pîsik dikim (lê em mirovan ji bîr nakin), bêriya hesinê ku li ber derî, me pê pêlavên xwe ji heriyê paqij dikir, bîna çekşoyê, e'rasa Amûdê ya qerebax û bi gemar, liv û bizava mirovan ya kûr. Ez dixwazim sûtê ji van tiştan gişan bigrim û berîkirina xwe bikim rewş û haletekî şaîrî û mîna mirovekî dan û stendîne bi wan re deynim û eger bikaribim wan haletan bi zîmanê helbestê saz bikim. Yanî rexên welat kûrtir bikim, wan wêneyên rojane ên ku wê gavê bala min nedikşandin. Nuha bi hêz tîna bala min. Çend tişt di vê çarçewê de min nivîsandine û ji alîkî din ve danûstendînen me li welat, ên bi hevalên helbestvan re; gava ku em li ser edebiyatê û tîkçûnên xwe, li ser tiştên ku di me de dihatin vemirtin dipeyvîn. Gava ku ez rojên xwe weke qoçanên kevnar radixim ber çavan, ez bêtir dişkêm û carcaran pê kêfxweş dibim. A nuha li biyaniyê ew heval tenê bîra min. Lê bi aram û bi kûrbûneke mezin û nêrînek pirr cuda ez bi wan re didim û distînim. Her roja ku ez li xerîbiyê dimînim, ez bêtir bi welat ve tîm girêdan. Bêrîkirin mîna elmasê ye, her ku roj û sal di ser re derbas dibin, bêtir dibiriqê û ez dixwazim ji vî tiştî sûtê bigrim!

Helbesta te cara pêşî kinga û li kû hat weşandin?

Helbestek bû bi navê "Tar û mar in li ser azadiyê", min ew sala 1980'î di rojnameyêke edebî de ku li Şamê dihat weşandin, belav kir, sala 1980'î û navê rojnamê bi Kurdî wisa ye; "Çanda Heftane".


Wek tu ji dizanî li Kurdistanê di bin îşxala Tirkiyê de xwendin û nivîsandina bi Kurdî qedexe ye. Loma erdê helbestê be-yar maye; dijmin nehîştîye ku ew jî wek bexçê her milê kulîlkên rengo rengo bide. Li ba we rewş çi ye?

Ez bawer dikim rewşa çanda Kurdî li Turkiyê weke ku helbestvanê Iraqî Sedî Yûsif dibêje, êşa xurt û mezin û dijwar belkî di dema xwe de tu afirandinên giranbuha neyê û wek mînak: helbestvanek di zindanê de ye. Ew zindan bi xwe jî di bejna mirovekî de ye, lê 15 mirov xistinê, wê gavê mirovê nivîskar wê bikaribe çi binivîse...

Lêbelê li ba me rewş ne weha ye, derdê herî mezin ji zîman dihat. Di dan û stendina rojane de em bi Kurdî diaxifin; li malê, li gel heval, dayik û bav. Lê dagirtina me bi edeb û çanda Erebi (zîmanê resmî) bûye sedem ku em bi

Jiyana li surgûniyê hey kerasekî ji êgir e, lê bi taybetî wek helbestvan, gelo ev jiyan tesîreke çawa li te dike?

Rast e. Ne tenê ji êgir e,



M. Eff Huseynî: "Helbest li ba min haletêkî bê rawestan e ji êşê, ji şîn û bêrîkirinê (Foto: Armanç)

Erebî binivîsîn.

Û ji ber ku çihana çanda demokratîk tunebû, loma problema me bûbû, emê çawa dengê xwe bighînin çarmedor? Me berê xwe da rojnamên Filistinî, Iraqî, Libnanî û nîfşên me bi piranî di wan rojnaman de nivîsên xwe diweşandin. Problem du beş bû, eger tu bi zimanê zikmakî binivîsî, cihê weşanê nîne. Eger tu bi Erebi binivîsî, naveroka helbestê ne li gora kêfa wan e. Îcar me berê xwe da rojnamên li derveyî Sûriyê.

□ Helbestek li ba te çawa dixuliqe? Gava tu di dinivîsinî tu gelek guherandinan tê de çêdiki, ya na?

□□ Gava kêfxweş bim, an ku jiyana min di kêlikên xwe yî normal de be, ez nikarim helbestê binivîsim.

Helbest li ba min haletêkî bê rawestan e ji êşê, ji şîn û bêrîkirinê, nemaze ji bêrîkirina zaroktiyê. Nivîsandina helbesta min ji van haletan tê. Çirokên pîrika min tene bîra min, ezê helbestekê li ser diwarekî herifî binivîsim. Bêhêvbûn êrîşî min dike, ezê li ser tiştên ku diçirsin, yan hatine vemirtin binivîsim. Ezê bêriya hevlekî bikim, li ser gav û seredanên ji nişkêve binivîsim, an li ser çirokeke evîne ku têkçûye.

Hergav rexnegiran digotin helbestên wî bi wêrinê pêçayî ne, lê ji vê pê ve nikarim, eger ne li ser êşê be, ne li ser şevên çûyî be, ez nikarim binivîsim. Eger ne li ser dîroka Midya be, ne li ser dîroka neviyên Midyan be, ew dîroka ku ji xwîne û neviyên ku herdem tene kuştin be, ez nikarim binivîsim.

Carcaran helbest tê, bêyî ku ez lê vegerim. Carna jî ez li gel helbestekê demêk dirêj radiwestim.

Bi tevayî gelek caran ez helbesta xwe ji nû ve dinivîsim, lê kêma û zêde dikim, bêyî ku ez dest bidim çarçewa wê ya pêşîn.

□ Ji bo te helbest çi ye?

□□ Mehmûd Derwêş dibêje: helbest ew e ku min bihejîne. Ez

man wê tiştêkî mezin û girîng ji wan bête der.

Gava ku li ser welat binivîsim, naxwazim pesnê forma wî ya giştî bidim -pêşmerge, çiya, çek- lêbelê dixwazim li ser wê kêlika (bistika) ku pêşmerge piştî şer tê mal, binivîsim. Çawa dif-

Gava ku ez rojên xwe weke qoçanên kevnar radixim ber çavan ez bêtir dişkêm û carcaran pê kêfxweş dibim. A nuha li biyaniyê ew heval tenê bîra min. Lê bi aram û bi kûrbûneke mezin û nêrînek pirr cuda ez pê re didim û distînim. Her roja ku ez li xerîbiyê dimînim, ez bêtir bi welat ve tîm girêdan. Bêrîkirin mîna elmasê ye, her ku roj û sal di ser re derbas dibin, bêtir dibiriqe û ez dixwazim ji vî tiştî sûde bigrim!

bi xwe nizanîm bê helbest çi ye? Û bi awakî akademîk ez nizanîm wê binîm zimên. Lêbelê dikarim wisa bêjim. Helbest heyîneke cuda ye, nêzîk dibe -pir, hindik-pencera yarê ye, kenê zarokêkî ye. Çiyakî bilind e, kaniyeke zelal e, roka destê sibêye, êşeke giyanî ye.

□ Helbesta te hêza xwe ji ku digre, ji kîjan çavkaniyan tîna xwe dişkîne? Kul û kederên çawa, sûretên çawa, Kurdîstaneke çawa di wê de xwe nişan didin?

□□ Hê helbesta ku ez dixwazim binivîsim, min nenivîsiye. Tiştên biçûk ku her roj em bi wan re didin û distînin û ji nav tiliyên me difilitin. Mase û boyaxa wê ya jêçûyî, tîkilî peyvên li ser linga û bi lez. Mebesta min ew e ku gava em wan movikên biçûk, hevokên hûr bidin ser hev, bêgu-

ikire, çawa bîna xwe digre, pêjnên wî, ponijandinên wî, xewnên wî... Çawa piştî xwe daye tehiê, bizava lingên wî û rengê avê di wê kêlikê de.

Kolanek ku ji nişkê ve tê bîra mirov, odayek ji peyvên şikestî, mîranî û tîkçûn. Wek ku Kafafî dibêje "tiştên nêzîkî dil ku roj bi roj em wan wînda dikin".

Hin tişt bi vî awayî min nivîsîne û hîn ez lê digirim, bi şînî û bi ihsasên ku hêdî hêdî dîrî mirov dikevin.

Gelek caran ez bi ser nakevim. Ez nikarim van tiştan, mirovan, jîndaran bidim serhev. Sedem ew e ku di cih de tê bîra min ku welatê min dabeşkirî ye... Di vê xalê de ez bi xemgînî radest dibim û dilê min bi pencên serdemê tê guvaştin, ez bi kurtepiştî ji xwe re dibêjim; çi bêbextiyeke dijwar e.

□ Di helbestê de tîkiliya şikil û naverokê hertim

bûye mijara munaqesê, nêrîna te li ser vê yekê çi ye?

□□ Naverok û ramanên pîroz helbestê nakin helbest. Eger doz û daxwazek min î mezin û giranbûha hebe, yan jî pejn û ihsasên min pîrozmend bin, ev nayê wê manê ku ez helbestvan im. Forma bilind divêt. Raman çiqasî bilind û pîroz be, gerek alav, form û şêwe jî di wê sewiyê de bin. Gava ku ez bixwazim li ser çiyên, an li ser bahoza ku li çiyên radibe binivîsim, divê ne tenê ez nêrînen xwe bibêjim. Pêwîst e zimanekî min î hunermendî yê di sewiya wî çiyayî û wê bahozê de jî hebe. Form û naverok jî hev cuda nabî. Di bawerîya min de helbesta

nar, a niha ne bes e. Divê tîkçûn û xewnên ku tînan gulebarankirin jî bêne gotin. Li gel van teva jî pêwîst e helbest tarîfî û bêhêvbûnê jî bêje û hêviya ku tu carî emê dev jê bernedîn jî bêje, ku hertim mîna agirê me yê pîroz e.

Bêguman helbest nikare roleke mezin di rawestandina vê trajediyê de bilîze, lê dikare hinekî wê siviktir bike, dikare wê bike wêneyek jîndar ya mirovê Kurd a sedasala bîstan. Mirovê di bin bombebarankirina gazê de an koçbarî çolistan Xwedê dibin, surgûnî û welat xwe li bin guhên wan dixin...

□ Nuha tu li ser çi dixebitî?

Ez bi xwe nizanîm bê helbest çiyê? Û bi awakî akademîk ez nizanîm wê binîm zimên. Lêbelê dikarim wisa bêjim. Helbest heyîneke cuda ye, nêzîk dibe -pir, hindik-pencera yarê ye, kenê zarokêkî ye. Çiyakî bilind e, kaniyeke zelal e, roka destê sibêye, êşeke giyanî ye.

bi rastî helbest be, dighêje her kesî û her cihî.

□ Li ber çavê hemû dinyayê gelê Kurd trajediyekê diji, di vî warî de rola helbestê çi ye?

□□ Li ber çavên min û ez li derveyî welat im... Ez dibînim ku di bîranîna welêt de rolek helbestê heye. Belkî ev helbest tirajediyake nû jî damizirîne, lêbelê gerek bêtir me bi movikên welêt ve girê bide:

Sibe, êvar, seqem û sobe, tîkiliyên mirovayî, xewn, şikestinên herçax. Gerek helbest van tiştan tevan bîne ziman û gelekî jî li hemberî xwendevan raweste û bikaribe vê dîrbûnê nêzîk bike û ya din xewna xweşik û çeleng ya vegeerê divê herdem bistrê.

Lê pêwîst e ev helbest bi realîta Kurdî ya nuha di kirîzê de ye, girêdayî be û bi nêrînen nû, bi bûyerên nû re bide bistîne. Stiranên li ser destanên Kurdan û mîranyên wan çiyên û dîroka kev-

□□ Ev demek e ku min dest bi nivîsandina helbestekê dirêj kiriyê û hê ez li ser kar dikim, ku navê wê "Medî guleke kevnar in. Guleke kevnar û pîroz in. Carekê bi hêrs û carekê dilerizin".

Ez dixwazim dîroka Kurd bi zimanekî helbestî raxînim ber çavan û hewl didim ku dîrî karê dîroknivîsan herim. Lê her ku ez di nivîsandinê de kûr dibim, ez nezanîna xwe nas dikim, nezanîna dîroka xwe, bi taybetî olên kevnar û tîkiliya wan bi Zerdest û agir re. Koçên wan heta ku bighêje serdema nû, şikestinên Kurd ji Mehabad heta sala 1975'an, heta Helepçe.

Min çend çavkanî ji bo vê pîrojê dane hev. Lê cardin pirr kêma in û di pêdakirina çavkaniyan de asteng li pêşiya min çêdibin.

Wê demek jî min re pêwîst be heta ku ez vê helbestê biqedînim. Lê wê ji bo min û ji bo nivîsarên min ên berê tiştêkî nûjen be.

Çirokek şikestî bo "ROZ"

Ez ne pêxemberekî bi kulîkên hesinî bûm
Û ne destên min gunehkariyê hildigirin
Devê min perçebûyî bû
Û tiliyên min di erênayê de mîna teyrekî tirsyayî bûn.

Bîna tûtûnê jî min difûre
Û ji tiliyên te jî sixêfên biçûçik
Min jî bo te balafirên kaxezi distra
Û firîştayan baskên te direvandîn
Û dengê te yê bilind mîna şahêkî bê çek
Te dibînim... û çirokan jî ba xwe çêdikin
Te xwe li paş dayika min vedîşart
Û devê min perçebûyî ye...

Ez nikarim xwe bidim ser te
Û tiştên te û cih û tu digirtiyayî
an tu xewê dikî dermanan û
di derziyê dikî derziya pişik
Û ez ne pêxemberê bi gumlek im, ku
bîna firîşte û nexweşxanan jê tê
Devê min perçebûyî ye mîna ferfûrtiyên çinê
Û qubên zaroktiya te dîr in
û...

Di dawîya çirokê de xwe davêjim ser rûyê xwe
Te dibînim...
Tu dengê min bi listîkek perçebûyî dughertî
Û bi derziyeke kevnar.

Mihemed Eff Huseynî
Wergêr: Ehmed Huseynî

Çîrok

Amrîta Birîtam, nivîskareke Hindî ya bi nav û deng e. Ji herêma Pencabê ye. Sala 1919'an hatiye dinê. Ew bi xwe helbestvan, çiroknivîs û romannivîs e. Endameke jî û jehati ye di yekîtiya nivîskarên Pencabê de. Sala 1955'an li ser diwana xwe ya helbestan "Nûçe" diyariya akademîkê sitand. Bi zimanê Pencabî dinivîse. Ev çîroka wê ya bi nav û deng, me ji zimanê Ereblî wergerandiye.

Pênc Xwişk

Nivîskar: Amrîta Birîtam
Wergêr: Ş. Cîrahî

Ev çîroka ku ezê ji we re bibêjim, li bajarekî mezin derbas bûye...

Carekê Jiyanê xwe bi ava zelal a kiristalî dişûst û bîna gulên vekirî bi xwe direşand û çekên xweşik û rengîn li xwe dikirin ku, di wê gavê de bang li Bê(Ba) kir:

- Min bihîstîye ku di dema me de pênc jin, pênc xwişkên min ên ciwan û delal dijîn.

Rast e, -Ba (Bê) lê vegeand.

-Dixwazim serekî li wan dim.

Ba di ber xwe de bişirî û dengê xwe nekir.

-Pênc diyariyên weke hev bo wan li cem min hene. Dixwazim li wan belav kim, ma tu yê bi min re werî?

-Baş e, weke ku tu dixwazî.

-Destpêkê emê herin cem a mezin.

-Bila. Lê xaniyê wê bê pencere ye, yek derî ye. Gava mêrê wê ji mal diçe, derî kilît dike û kilîtê bi xwe re dibe û li vegeerê jî ji hundur ve kilît dike.

-Dixwazim tu bi riyekê min bi-bî cem û divê ez hinek bîn jî bi xwe da kim.

-Na, na. Jixwe bîn ji min difûre. Ji bilî vê jî tu barê min giran dikî! Çi gava ez diçim wê malê, di qul û qulqulkên derî re çermê laşê min birîn dibe. Lê dîsa ji te re textsîr nakim.

Bê Jiyan ajote mala xwişka mezin.

-Ev çi rîsm in li ser diwêr? Jiyanê bi dengê bilind bang kir.

-Bi hezaran in!

Ev diwar ji kevin de wiha ye. Çi jina di hundur de dijî, zêdeyî qiraxa derî nabîne û kengî çû ser heqîya xwe, wênêya rûçêkê wê li vir, li ser vî diwarî tê kêşan.

-Gelo tu jin ji vir demeketine?

-Na..! Tu carî nebûye.

-Ev çi diwar e?

-Nav lê dikin; adet û teqalîd. Teqalîdên cîns, êl, ol û civaka li vir in.

-De were em berdeyam kin, herin cem xwişka te yî din. -Bê got.

Ew kî ye?

Lê binêre. Parçê komiran ji ser hesinê tirênê dide hev.

Bi rastî jî, jineke sî salî li wê navê bû û bi destê çepê qerpalkê xwe li xwe dipêça û bi yê din jî perçên komirê dikirin zembîla xwe. Li erdê jî nêzik ve zarokêkê dest bi girî kiribû. Dê ber ve çû û ew hilgirt. Zarok serê xwe kuta nav sînga dêka xwe, lê şîr tune bû û ji nû ve dest bi girî kir.

-Xwişkê! Jiyanê bang kir û ber bi jînekê ve çû. Lê wê bersîv neda.

-Xwişkê! -Ji nû ve ban kir.

Jînekê serê xwe rakir û bêtî ku deng bike, awirek dayê. Guh nedayê. Te digo bang ne jê re ye.

-Xwişkê! Jiyanê kir qîrîn. -Ez Jiyan im.

Jînek bi zaroka xwe ve mijûl bû û wer kir fena ku deng ne çûbiyê.

-Ez hatime welatê te, gihame bajarê te; dixwazim tekevim xaniyê te. Jiyanê got.. Jînekê bi ecêbmayî lê nêrî, serî di ber de diponijî.

Dixwazim tenê awirekî bavê min ser xwedîya malê.

-Tu yê çawa derbas bî, tu nikarî wek tîrêja tavîkê bi xwe têkevi hundur?

-Hey Ba! Ma tu nizanî ku em di sedsala bîstan de ne? Çiye tu basên welê dikî ku hemû hatine jîbirî kirin!

-Bi sedan sal ji vê malê re zeman û dem nînin.

-Ma ne min diyariyek jê re heye. Dixwazim bidimê.

-Û heta diyariya te bibîne jî, ji dest te nagire.

-Bo çi?

-Ji ber ku her tişt jê re qedexe ye.

-Gelo ku bangekê bidim, wê dengê min nebihîze?

-Na.

Jê re neçar e, ta guhdariya dengê ji der tê bike.

-Çi bi te hat Bao! Hîna ciwan e.

-Tu dema bi salan dipîvî. Xwişka te ji biçûkayî ve nîzane zarokî çî ye û ji wê gavê ve pîr e.

Jiyanê ta girt, ma ecêbmayî, bi xwe zanibû ku êdî bê çar e.

-Çima tu sînga xwe nadî zarokê, dibînim ku digrî.

Jînekê li laşê xwe yê ji çerm û hesî nêrî û pê re awirek da zaroka xwe.

Gelo wê ev çikûsî kiriba, eger rê bidîta?

-Mala te ji vir dûr e? -Jiyanê jê pîrsî.

-Li qiraxa din a vî çermê gemarî ye.

-Ezê bi te re werim mal.

-Mala min tuneye, tenê koxikeke ji çitika ye.

-Dîsa jî dixwazim bi te re bêm.

-Heta doşek jî tuneye. Em li ser qerpalên kevin radizin.

-Û mêrê te?

-Nexweş e...!

-Li kûderê kar dike?

-Di karxaneke biçûk de. Lê ji par ve bêkar hiştine.

-Çima, çi bû?

-Ji wê gavê ve nexweş ket, ev salek bi temamî bûrî.

-Te ev zaroka bi tenê heye.

-Na, lawikek jî li cem min heye, lê...

-Kanî?

-Carekê birçî bû... Sêvek ji yê dikandar dizî, rabû xistine hebsê.

-Tevî wê, tu mêvana dihevinî?

-Tu kî yî?

-Ez Jiyan im.

-Ha..! Min heta nuha navê te nebihîstîye.

-Ma gava ku tu zarok bû, li ser min çîrok ji te re nedigotin?

-Belê, diya min gelek çîrok ji min re digotin. Bavê min ji wan gundiyan bêzevî bû. Ji roja xwişka min a mezin dane mêr, heta îro em di bin deyna de man. Mirêbdarê me destê xwe avête ser malê me, se-wal, pez û hacetên xanî... Bavê me koçê me bar kir welatêkî dûr, ji bo pîrsa nan. Bi şev diya min xew nedidî û tim ez ji xew şiyar dikirim û çîrok ji min re li ser cîna pîrhevoka û Xwedê digotin, lê navê te min qet nebihîstîye.

-Û bavê te, çi pê hat? Tiştêk bi ser xist?

-Diya min ji min re digot, gava ew bê, wê maldariya me çêbe û wê destê me fire bibe. Lê hew vegeriya... û tu? Bi dengê tîrs û melûl got; Tuyê jî tiştêkî ji min bistînf?

-Ez? -Jiyanê bi heyranî got.

Jînekê dest avête zembîla xwe û da xwe.

-Min diyariyek ji te re aniye, bigre. -Bi gotina xwe re Jiyanê zembîleke xweşik danî ber.

-Na xwişkê bila ya te be -Jînekê bi tîrs li dor xwe nêrî û got.

-Ma ne min ji bo te anî.

-Na, na xwişkê. Sibe kesek di destê min de bibîne, wê bibêjin di-ziye.

Û jînek bi rîya xwe de çû, gava dît ku Jiyanê da pey, rawestiya û li ber geriya.

-Vegere, vegere xwişkê! Bela xwe ji min veke. Carekê xortek ji bajarê hate vir, soz da ku karekî ji bo mêrê min peyda bike û lawikê me bide berdan. Tê bîra min, çûme ba cîrana û min ard deyn kir û xwarin danî ber. Piştî re em bi hev re çûn bajarê ji bo dîtina kurê xwe, lê di rê de... di rê de... jînekê keserek veda, ji fedîya rû sor bû û bi lez bi dûr ket.

Bê, hêstîrên Jiyanê paqij kirin.

-Em herin ser oxira xwe! Bê got... Ezê te bibim cem xwişka sisîyan.

Dema nêzikî li Qesreke bilind û xweşik kirin, Bê devê xwe xiste ber guhê Jiyanê û got:

-Ev e mala wê.

Dergevan di cî de rê neda Jiyanê, da yekser derbas be. Emir da xulamêkî ji bo ku xatûnê bi hatina hin biyaniyan agahdar bike. Jiyan li ber derî, li benda bersîvê ma. Piştî destûrdanê, da pey xulam û derbasî hundirê qesrê bû. Ê xulam perda hevrişimî da alî, Jiyanê hew dît ku wa ye di eywaneke fireh de ye.

Li qozîkê ji yên eywanê çavê wê li heykelê (tîmsal) pîrekekê ket. Ji mermera sipî, di nivê mafûreke avê de hatibû danîn. Xatûna malê ya rindîk jî weke tîmsalekê li ser kursiyekê mezin î delalê rûniştîbû. Li mêvana biyanî nerî û pîrsî:

-Tu kî yî? Ez te nas nakim.

Dema xatûnê deng kir, Jiyan lerizî û li xwe varqilî. Nêzikî tîmsalê bû, destê xwe dayê. Bi cemeek kevir hisîya. Pê re nêzikî li jînekê kir. Laşê wê yê nazîk, nermîk we-ke lastîkê bû.

-Ez Jiyan im.

-Jiyan? Xatûnê ji nû ve pîrs kir. Bawer dikim min ev gotin ji derna bihîstîye. Dibe ku di hin pirtûkan de jî min dîtûbe, ger ne şaş bim.

-Di pirtûkê de?

-Hate bîra min! Xortekî bi min re li dibistanê dixwend û helbest dinivîsandin. Carekê defterek diyarî min kir, helbestin tede hebûn, di nava pelê wê de cara yekem min ev nav xwendibû.

-Vêga ew xort kanî?

Lawê malbateke belengaz bû. Bi

rastî nizanîm pê re çi pê hat.

-Ka deftera wî?

-Piştî me ji vê qesrê bar kir, hemû tiştên kevin min li şûn xwe hiştin. Her tişt li vir nû ye weke tu dibîni.

-Û buha ye jî.

-Mêrê min di şûnkariyê (mensîb, rêz) bilind de ye û bawer dikim di hilbijartinên bê de dîsa wê cî bigre. Dîsa emê karibin bi peye bijîn.

Xatûnê tebeqek ji fêkî pêşkêşî ber mêvana xwe kir.

-Ev fêkî nû ye... Fermo!

Dibînim hîn şil in, xwiya ye xulam ew ziwa nekirine piştî şûstîne... Axx îro ez bê hal im.

Mêvanê pêşniyar kir;

-De em herin hinekî li derve bîna xwe berdî, heger tu dixwazî?

-Na, na, nikarim herim seyranê. Tenê bi kesê ji çîna xwe re didim û distînim. Hîn ez ji operasyonê (emeliyê) rihet nebûme. Caran sergêjiyek tê min.

Jiyanê da xwe, nêzikî jînekê bû, destê xwe danî ser destê wê ye sar î cemidî û pîrsî:

-Xwişkê çima dilê te lê naxe? Tu weke kevir sar î.

-Ev e nexweşiya min. Mêrê min dixwaze em herin Amerîkayê. Li wir doktorên jî û hêja hene. Dibe ku operasyonêkê ji min re çêkin.

-Çi operasyon?

-Gava keçek ji tebaqa têr dize-wice, di seva bûkaniyê de doktor jê re operasyonê çê dike.

-Ev cara pêşîn e, dibihîzim.

-Bawerim wa ye. doktor sînga bûkê diqelêse, dilê wê radike û yekî ji zêrê de diçîne. Ev operasyon ji min re jî çêkirin, lê baş bi ser neket. Ji ber vê caran ez bi êşê dihesim. Piştî hilbijartinan eger mêrê min bi ser ket, emê ji nû ve herin Amerîkayê, bi yek carî wê min rihet bikin.

-Min diyariyek ji te re aniye, xwişkê.

-Na, na... Dev jê berde! Mêrê min wê qebûl neke. Hilbijartin nêzik in û ya din jî perê me di bankê de pir in û em ne muhtac in.

Zengilê telefonê lê xist. Xatûnê bersîv da û bihnikê peyivî, dû re ji mêvana xwe re got:

-Wiha xwişkê, careke din fermo ba me. Mêrê min telefon kir, berê wî li mal e û hin mêvan pê re tî.

Bê bi destê Jiyanê girt û bire cem xwişka çaran.

Maleke adetî bû, lê li devê derî tîrebêleke xweşik sekinî bû. Jiyan bi derencan ve hilkişîya û kete hundur. Jîneke 22 salî li malê bû, zaroka xwe dikire xew. Ji hundirê malê û tikûziya wê mirov tu zengînî lê nedidî, lê jînekê fîstaneke xweşik ê rengîn li xwe kiribû.

Kî ye? -Jînekê da xwe, gava dengê pêjnekê hat.

Li mêvana xwe nerî û bi serê lêvê got: -Ev tu yî?

-Belê ez im. Jiyan im.

-Dizanim.

-Dizanî?

-Belê her gav li pey siya te dire-vim. Hêz di min de nema, êdî nika-

rim bidim pey te. Tu ji kû hati yî vegere wir...

-Xwişka delal...

-Xwişkê? Jînekê gotina wê birî. Çi xwişk û çî hal. Ez bê kes im.

Lê, ma ev ne zaroka te ye? Jiyanê berê xwe da zaroka di xew de û ev gotin kir.

-Belê kurê min e... Lê bê bav e!..

-Ez tê negihîştim.

-Gava dara azadiyê di welatê min de hate çandin, min rehên wê bi xwîna xwe av dan. Lê şeva ku fenera bex-tiyariyê birûsk û ronîya xwe da welatê min, şeref û rûmeta min bi xwe re şewitand. Ev lawik şana wê şevê, xweliya wî agirî ye.

-Ox xwişka pepûk.

-Ji wê çaxê ve şevên min hemû weke hev in... Tu çiqas dihatî xew-na min Jiyanê. Min çiqasî di-xwest ku ew xewn rast bin û hemû xelk bi daweta min dilşad bin...

Min ji xortekî gundê xwe pîr hez kir. Lê rojekê diz û muxlacî hatin gundê me, bav û birê min kuştin û pê li şerêfa min kirin. Jareke mara bû kete laşê min û nema ev tîn jê diçe. Ji wê çaxê ve ye hey Jiyan, te piştî xwe da min. Wê gavê digotin ku dibe ez karibim vê jehrê ji canê xwe bavêjim. Lê min nikaribû. Evîndarê min ez qebûl nekirim. Ji evî devê deriyê mala xwe qewitandim. Çiqas bi min ne xweş bû, çendî dilşikestî mam. Te tî-rembêlek li ber derê me dît? Ew ya yarekî ji gelek yaran e. Jiyanê nizanibû çî bersîvê bidê. Hêsir barandin. Ew diyariya ku di dest xwe de girtibû, hemû jî hêsiyan şil bû.

-Ev çi ye? Diyarî ji min re?...

Tu nabîni ku ta bi serî ez ji jehra rezîltiyê tijî me. Ox çiqas rindîk e û bîna wê xweş e. Lê jehir ji laşê min dibare.

Jiyan ji hal ket, bi zor xwe li ser lingên xwe digirt. Piştî bêhna wê hate ber. Bê, ew bire mala xwişka pêncan.

Di eywaneke fireh de keçîkek bîst salî, ciwan û nazîk rûniştîbû. Komek pirtûk, sazêk û hemû ren-gên wênêkêşanê li tenîştî wê bûn. Jiyanê keserek veda. Keçîkê destê xwe avête sazê û hin awazên nermîk jê barîn, hêsir bi çavan ketin. Dû re saz danî, destê xwe avête firça risman û rîsmekî xweşik çêkir.

Jiyan şaş ma û ji kesera dilê xwe re wê keliyê xwest ku destê wê hunermendê ramîse. Xanî ji bêhna vê hunera giranbuha dagirtîye. Bîna Jiyanê hate ber û ber bi keçîkê ve çû û selîka diyariyê dirêj kir.

-Ez Jiyan im. -Matmayî bi çavekî beloq li keçîkê nêrî.

Ez dizanim -di ber xwe de got, bê ku ji cihê xwe bilivê. Ji nişka ve çavê Jiyanê bi wê tore (şebeka) hasinî ket, ya ku li ser dirêjiya derî, wê û keçîkê ji hev vediqetand. Lingên wê bi erdê ve man.

Îşkence di ganî merdim kesey...

Dewamê riperê 10

Qando ki nêwaştê şopî polandê (qolandê) mi di bimana, verî sunger yan jî çiyêdo zey sungerî polê mi ro piştê, dim a polê mi dar a (yan jî borî ya) "askî" ra girê dayê.

Bi gurmisan (girmikan, nuncikan) û paşkilan (payan) a dayê mi ro. Semedo ki bi gurmisan a zaf da sere, çenge (çene) û goşandê mi ro, mi hefteyê nêşayê fekê xo weş akera, çî bicawa û goşê mi nîm-kerr bibî. Goşê min jî çengeyê mi nezdî panc mengî tewayê (de-jayê). "Askî" hendi pêt girêdabi ki polê mi hewna (hona, hima) jî teweno.

Semedo ki waştê mi hêz (qewet) ra bifînê, ez pay ra, lingan ser o dayê vîndernayîş (dayê 'edelnayîş) û bê aw û bê werd û bê hewn verdayê.

Tehdît, şantaj, nengî û heqaret îşkencexane di tebayêdo "normal" o. Îşkencekerdo-xan vatê "Ma do to bikişê û vajê rema, o semed ra ma kişt".

"Askî" û cereyanê elektrîkî ra pey, awa serdi mi ser ro kerdê û ez eştê hucra bêhewa û tarî.

Goştareykerdena qirri û nalîya embazan ê ki îşkence di yê jî metodanê bitesiranê îşkenci ra yo.

Semedo ki ez binê îşkenci di jî kamîya (huwîyetê) xoya Kurdî rê wahêr vijiyaya, îşkencekerdoxî hîna har biyê.

Mehkema di semedê tes-bitbiyayen û mehkemekerdena îşkencekerdoxan mi dilekçeyê day, labelê hakimî va "No wezîfeyê ma niyo". No jî musneno (nawnenno) ki îşkence parçeyê politîka dewleta Tirkiye yo.

-To gore, îşkencekerdoxî zafê zafan ehemmiyet danê kam xusûsan? Kam tewir metodê îşkenci hina zaf merdimî ser o tesîr kenê?

Îşkencekerdoxî sifte (hona vernî) ra wazenê çimê merdimî bitersanê. Qandê ney jî çîçi towredê (pêlekde) înan di esto, lezi veng kenê. A game di wazenê merdimî destan xo ra verado, teslîm bibo. Eke o jî nêbo, wazenê heta merdimî ya sisti (ze'îfî) bişinasnî ki giraney bidî a heta sisti ser.

Gama ki no xusûs di jî serî nêşî (muzaffer nêbî), wazenê to bitersanê, hissê mergî bidê to. Eger merdim merdena xo ji xo çim a kero, yanî mergî rê jî amade (hazîr) bo, o wext îşkencekerdoxî do fam bikerê ki înan rê di ray mendê: Yan ganî (gerek) to bikişê, yan jî mecbûr manenê fek to ra veradê.

Gege jî winî ze "ciddî" rol kenê, wazenê to winî bitersanê ki ti vajê qey hinî peynîya dinya yena. Vanê filankesî hendayê çî vato, filankesî heme çî îtiraf kerdo, bê-vankesî nameyê to dayo ûtb.

Tepîştana ma di jî nê heme çî bî. Labelê ez şena vaja ki o ki sebebê teslîmbiyayîş, qisekerdiş û xoverradayîşê yanî zeki bi Tirkî vanê "çözülme" yê merdiman beno, îşkenceyê fîzîkî niyo. Sebebê "çözülme"y,

ze'îfeya me'newîya merdiman û sistbiyayena bawerîya merdiman a. Eke merdim wahêrê asar (winasî) bawerîya xurti bo ki gama ki îcab bikero bişîyo mergê xo zerardayena bi şoreşgeran û welatperweran ra tercih bikero, o wext teslîm nêbeno. Wazenê wa ci ra tîkey ci kerê yan jî se kes bêro vera ci, ci ser o ifade bido, merdimo ki wahêrê inasar (winasî) bawerî bo, destan xora verra nêdano, raya xayîney di nêşino yanî zeki bi Tirkî vanê nêdekeweno "teslimiyet batağî".

Bêguman jew (yew) çîyo ki prosedurê (süreç) teslîmiyet û "çözülme"y hazîr keno îşkenceyê fîzîkî yo, labelê çîyo ki ney virazeno û netîce tayîn keno sistbiyayene yan jî pêtnêbiyayena bawerî ya.

-To gore, şoreşger (devrimci) ganî îşkence di se biko? Ti bi xwi tecrubey nê tepîşiyayîşî ra çî bander bî (çî musay) û no xusûs di şoreşgeran rê şîretê to çiyê?

-Mi gore, îşkence di çîyo en

"Îşkence di çîyo en muhîm o yo ki merdim qet zerar nêdo embazanê xo ro û organizasyonanê sosyalîst, şoreşger û welatperweran ro; prensîp ganî no bo."

muhîm o yo ki merdim qet zerar nêdo embazanê xo ro û organizasyonanê sosyalîst, şoreşger û welatperweran ro; prensîp ganî no bo. Kam merdimî ser o çî ifade dano wa bido, polis derheqê merdimî û embazanê ci di çî zano wa bizano ganî merdim fek nê prensîbê corîni ra vera nêdî.

Ti mecbûr niyê ki îşkencekerdoxî bidî bawerkerdiş (îqna bikî) labelê ti mecbûr ê ki prensîp û îdealanê şoreşgerki mudafe'e bikerê. Tanî çî estê ki ti jî zanê ki bawerîya îşkencekerdoxî pey nêameya (îqna nêbiyo), labelê eger ti heme çî xo çim a kerî înan rê di ray manenê: Yan ganî to bikişê yan jî fek to ra vera dê.

Ê mi jî wina bi. Heta ki îşkencekerdoxan fam nêkerd ki ez bi mergî jî razî ya, labelê bi "çözülme" û teslîmiyetî razî niya, fek mi ra nêverada.

Îşkencekerdoxan tanî merdimî ardê mi ri ki înan ra çend tenan çîyo ki zanayê vatê. Îşkencekerdoxan jî îfadey nînan girotê bi zûran a xemilnayê û waştê ki ez jî qebûl bikera. Labelê çîyo ki zerar dayê û şayê zerar bido embazan, organizasyonandê şoreşger û welatperweran, mi qebûl nêkerd; mi prensîp û îdeale şoreşgeray mudafe'e kerd.

Îşkencexane di semedê moraldayeni û tesîrkerdena embazan û kesanê qisekerdoxan û xoverradayoxan (çözülmuş) ganî merdim tanî rayan bivîno. Mesela, gama ki îşkencekerdox vajo filankesî to ser o ifade dawo, ganî merdim vajo ki "bi-

yarê wa ridê mi di vajo". Wexta ki nê merdimî ardî, ganî merdim çî dîrekt çî îndîrekt tanî sinyalan bido înan ki hêşê xo biancê seredê xo û bi tedbîr bê. Mi bi xo na ray ceribnay û tesîrê ciyo pozîtîf çend kesan ser o jî bi. Heta gama ki mi fam kerd ki cay îşkenci û hucrey jew (yew) ca di yê û vengê merdimî şino merdimanê hucran, mi "askî" di slogan eşt, mi va "Bijî Kurdistan!" Vengê mi şîbi embazan û tesîro hewl înan ser o verdabi.

Îşkence di ganî merdim kesey û kamîya (şexsiyet û huwîyetê) xo ya millî û de'wa Kurdey jî mudafe'a bikero (biko). Wazeno wa merdim organizasyonêk di bo wazeno wa xoser bo, ganî nê çîyan mudafe'e bikero.

Operasyonê ma no jî musna (nawit): Wareyo (sahaya) ki merdim tey girweyêno û mucadele keno, ganî merdim prensîbanê ci bi disiplin û bi wurdakarî (titizce) biyaro ca. No vatey verênanê ma ganî caran (qet) ma vîr a nêşêro: "Aw û adir vîndenî, dişmen nevineno." Yanî ganî merdim bidîqqet bo û bizano ki dişmen nêrakeweno.

-Gelo şaşeyê ki to bi xwi û embazanê to polisi dest di, îşkence di yan zi mehkema di kerdî, estê?

-Embazê ki operasyonê ma di ameybî tepîştîş, înan ra çend tenan -mesela Zulkuf Ozel- weş verxuda (direndi), qisey nêkerd û zerar nêda çî keşî. Çend kesê ki polîsan tersanay û bi tewir tewir dek û dolavanê psikolojîkan xapênay jî xo verra da, qisey kerd û teslîm bî. Sebebê ci jî zeki mi verî va, sistey û kemaneya bawerî û gama ki îcab kerd xo çim a nêkerdişê mergî bi, mergî rê hazîr nêbiyayîş bi.

Bi fikrê mi, îşkence di, polisi dest di û mehkema di mi şaşey nêkerdî. Labelê verê tepîştîş şaşeya mi bî. Şaşeya mi a bî ki ez hîna (daha) bidîqqet û wurdakar (titiz) nêbiya.

-Sewbîna çiyê ki ti bi-wazî vajî estê?

-Ez wazena ney vaja: Wexta ki merdim welatê ma di sosyalîst, şoreşger û welatperwer bo û qandê hedefan û îdealanê xo mucadele bikero, operasyon û tepîşiyayeni çiyêdo normal o. Labelê o ki normal niyo, tepîştên û operasyonan di zerardayîşê prensîp û îdealanê şoreşgeray û sosyalîstey, embazan û organizasyonanê şoreşger û welatperweran o. Bêguman tepîştîş û operasyon bi xo jî zerarin o, labelê qestê mi o zerar o ki, teslîmiyet, xayîni û xoverradayîşî ra yeno. Ze prensîp jî, merdim kotî beno wa uca bibo, ganî zaf bi dîqqet û disiplin bo.

Qandê ki şîma no îmkân da mi ki çîyo ki mi ser ra ravêro ez vaja, ez zaf teşekkür kena û mucadeledê şîma di serkewtênî wazena.

-Ez zî teşekkür kena.

Hindik-Rindik

DOR

Yekî Rûs li Moskovayê ji bo ku ji xwe re şuşeyek votka bikire, ketibû dorê. Dor pîrr dirêj bû. Seetek, du seet, sê seet dor nayê. Qey êdî hew xwe radigre, bi hêrs ji dorê derdikeve û dibêje, "ev jîyan bi vî hawî nayê kişandin, ezê herim Gorbaçov bikujim". Piştî seetekê serê wî di ber de, qerde qerde cardin bi paş de hat. Ji kesên dorê yekî gotiyê:

-Te kuşt?

Mêrik got:

-Na, dora li wê derê ji ya vir geleki dirêjtir bû.

HUZÛR

Rojekê Gorbaçov ji Xwedê re gotiye "Xwedêyo, wek ji te ve ji xuya ye, halê me ne tu hal e, rewşa millet pîrr xirab e. Ma wê kinga huzûr were welatê me jî?

Xwedê gotiye, "li min bibore, ez geleki muteesîr im, lê di dema min de wê ev huzûr neyê".

(PÊGÛHURK) MUBADELE

Li Bulgarîstanê grûbek turist li fabriqeyekê ku didûkan (tûtikên, duduk) ji seramikê çê dike, geriyane. Ji mudûrê fabriqê re gotine, hûn dibêjin, "em salê milyonek didûk çê dikim, ma ev ji we re ne pîrr e? ...Hûnê çî bikin ji hewqas didûkan?

-Em her didûkekê bi mîhekê didin Moxolîstanê.

-Almanya Rojava serê her mîhekê motoreke elektrîkê dide me.

-Ê hûn hewqas motor çer dikin?

-Çekoslavakya serê her motorekê traktorekê dide me.

-Ê, salê milyonek tiraktor, ma ji we re ne pîrr e?

-Pîrr e, çawa ne pîrr e!... Lê em traktorê didin Sovyetê û ew jî li hember wan, axa em pê didûkan çê dikin, dide me. Û dûre jî rûdînin vedixun, hevkarîya aborî ya Bulgar û Sovyetê pîroz dikin.

Amadekar: Zinarê Xamo

ÇOTIYÊN NAWDARAN

Amadekar: Firat Cewerî

Dilxerabî hertim bi evîndariyê re derdikeve, lê ew hertim bi wê re namire.

Rochefoucauld

Ramûsana pêşî hertim tê bira jinê, lê mêr ya dawî jî ji bir dike

Remy de Gourmont

Ger tu li dû evîndariyê bigerî, ew ji ber te direve, lê ku tu ji ber birevî, ew li dû te digere.

Gotineke Îngilîzan

Evîndarî ji dilxerabiye dizê, dilxerabî jî evîndariyê dikuje.

Kristina

An jin mêr dixapîne, an jî mêr jinê dixapîne.

Sören Kierkegaard

Dostanî pîrî caran derbasî evîndariyê dibe, lê evîndarî tu caran derbasî dostaniyê nabe.

Lord Byron

Ji bo zewacê, xwe bi hemû hêza xwe ve biêşîne. Ger tu jinek baş bi dest xwe bixîni, tu dê bextiyar bibi. Lê ku jinek nebaş bi dest te bikeve, tu dê bibi feylesof.

Sokrates

Zewac jî wek çûkên qefesan e; yên li der dixwazin tê-kevin hundir, yên li hundir jî dixwazin derkevin der.

Michel de Montaigne

Pênc Xwişk

-Ez nikarim te derbas kim -keçî-gotê got û serê xwe berda ber xwe.

-Sedem çî ye?

-Ox ku tu şevêkê li min bûbûya mêvan û ketibuya nava xewnên min û te bi min re heta sibehê qedandiba! Ma min çî dixwest û çî nedixwest, ji te re bibêm û ji te bipirsim! Ji mêj ve li te digirim. Bi van rengan min ew rismên te çêkirin û bi vê qelemê min li ser evîne çîrok nivîsin ku bi xwe jî yek ji rengên te ye.

-Va îro ez hatim. Çima tu min nahewîni?

-Dengê xwe meke! Li van diwaran binêre, tije kulek û qulik in ku çavên ji tîrên çavsorî û zikreşiyê digirtî, tê re li min temaşa dikin. Eger nêzî te bibim, wê ev tîr bêne min, wê tîlên saza min biqetînin, qotîka rengan birjînin û wê dilê çîrok û helbestên min ji wan bê

hingavtin...

-Ma ne ew xelk hemû guhdariya awazên te dikin, çîrokên te dixwînin, çavên xwe ji rismên te diçêrînin.

-Bizane ku hemû hunermend, hozan û helbestvan li ser te dibêjin, bêyî ku rûyê te bibînin, eger qedera yekî ew bû ku çavê te û wî li hev ket, mirina bê çare nesibê wî ye. Nikarim te bihewînim, cihê te li cem min nîne, tenha di xewnan de.


-Min diyariyek ji te re aniyê.

-Vêga nikarim ji dest te bigrim, careke din. Gava ez sibehê zû ji xewê rabim, ezê helbestên ser te binivîsim û rûçikê te fîsim kim. Û ezê sitranan li ser şîrîhîbûna te bibêjim. Lê niha here... Dîtûsim ku yek me bi hev re bibîne...

Bi van gotinan re keçîkê piştî xwe da Jiyanê.

OSMAN AY TAR:

"Îşkence di ganî merdim kesey û kamiya xo ya mîllî û de'wa Kurdey jî mudafe'a bikero."



Osman Aydar: "Ti mecbûr niyê ki îşkencekerdoxî bidî bawerkerdiş, labelê ti mecbûr ê ki prensîp û idealanê şoreşgerkî mudafe'a bikere."

Şoreşgeranê Kurdistan ra Osman Aydar zî heway gelek Kurdistan çend serrî ra ver ze multecîyo polîtîk şîbi Swêd (Isveç). Labelê Osmanî nêwaşt hetanî peynî wica multecî bîmano, ay samed ra zî ageyra welatê xwi Kurdistan û tanî zeman wica di, tanî zeman zî Estambul di mend. Osman û ciniya xwi û embazê xwi menga Hezîrana 1990 di Estambul di bi destê polîsanê Tirkîyan amey tepîştîş. Nê operasyonî di polîsan Dîyarbekîr di zî 33 merdimî tepîştî. Osman bi îddîa endameya (üyelik) Komîteya Merkezî ya Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan, kesê bîni zî bi îddîa endamey û idarekerdoxeya na partî ameybî tepîştîş. Nê kesan nîzdî yew mengi îşkenceyo giran di. Mehkema ra pey fahm bi ki nê kesan ra çend tenî û bilhessa Osman û ciniya ci verê tepîştîşî nîzdî meng û nîm roj bi roj amey taqîbkerdiş. Mehkema ra pey raporê polîsanê ki Osmanîni taqîbkerdiş kerdîbî kewt ma destî, no rapor raporêdo enteresan o. Polîsan deqa bi deqa, se'et bi se'eti Osman taqîbkerdo û ey se ki kerdo, înan rapor kerdo, nuştî.

Muxabîranê ma ra R. Barîçekî telefon di Osman Aydarî reydi roportaj kerde. Şîma cêr ra nê roportajî wanenê.

-Embaz Osman ti key û senî amey tepîştîş?

-23'yê Hezîrana 1990 di, polîsanê siyasîyan Estambul di çosmey keyedê ma girot û ma (ez û ciniya mi) tepîştî. Polîsî senî dekewtî zeredê keyî nê-dekewtî, ez eşta 'erd û çiyê mayê keyî heme ser û bin kerd.

-Gelo çî rê ti tepîştî?

-Ez bi îddîaya endameyiya PPKK ya amey tepîştîş. Feqet di 'eslê xu di, no operasyon parçeyêndê a polîtîka yo ki, dewleta Tirkîyan vera sosyalîst, şoreşger û welatperwerandê Kurdistan domnena (rame-na).

Zeki... karr, gama ki h... Kurdan xurt beno ya... xurtbiyayîşî şîno, dewleta... nema lezkanî (bi lez... yî) tedbîran gîna û tarî... erzena. Operasyonê... benê jî parçeyêndê... gaman û tedbîran ê.

-Hina verî ti caran (qet) emeybî tepîştîş? Hetê polîsî û îşkencî di tecrubey to estbî?

-Nê. Verî ez qet niyamebiya tepîştîş, yanî tepîştîşê mi fina (raya, gilanga) sifî bi. Qandê ney jî tecrubeyê mi derheqê îşkence û polîsan di çînebî.

-Derheqê îşkencî di çiyê ki to verîna eşnawitîbî, to zanaynê û çiyê ki to bi xwi îşkence di di, pê mendîni?

-Mi îşkence û metodê polîsandê îşkencekerdoxan (îşkencekaran) ser o zaf çî wendîbî, goştarey kerdbî û filman di dibî. Îşkence di hetê sistî û pêtî (kiştê ze'îfî û xurtî) yê kesî kamcîn ê? Kê bi teresey, kê bi camerdey, ciwanîkey û ganfîdayey a xo musnayo? Nê xususan merdim şeno tanî kitabî û nuştayan di bîvîno.

Na mesela di hem welatê... di hem Tirkîye di hem jî... nê binan di zaf çî esto ki mer-

dim şeno ci ra ders û aqil bigîro. Zîndanê Dîyarbekîrî, sere ra heta peynî no babet di jew laboratuwaro gird o. Zîndanê Tirkîye û dewletanê bînanê ki zey polîtîka dewletî îşkence kenê yan jî kerdo, bi hezaran camerdey û ciwanîkey û teslîmîyetey rê, qehremaney û xayîney rê biyê şahidî.

Gama ki îşkence bi mi kerdê, ay çiyê ki mi wendîbî, goştarey kerdbî yan jî filman di dibî heme, zey şerîtê filmî çîmandê mi ver ra şiyê-ameyê, kewtê mi vîrî. Heta metodandê îşkencî ra, zeki ez verî nê çîyan bîvîna, tebayê (çiyê) mi rê surprîz nêame. Helbet semedo ki fina verêni bî ki ez kewtbiya destê polîsî, mi meraq kerde, mi vatê "Tirê ('eceba) dardakerdiş, şokê elektrîkî, şîdênayîşê testîsê (gun, hak) merdimî senî beno?" Gama ki nê metodê barbarkî mi ser o jî cerîbnay, hinî no meraq jî nêmend.

Wexta ki îşkencekerdoxanê Tirkîyan babet-babet metodê îşkenceyê fizîkî û psîkolojîkî mi ser o cerîbnayê, hêşdê (aqîldê) mi ra nimûney sosyalîstî, şoreşgerî, welatperwerî vîyarîni ki semedê zerarnêdayena bi embazanê xo, zerarnêdayena bi organizasyonanê şoreşger û welatperweran ganê xo dabi, seqet mendîbî, ameybî dardakerdenî ('îdam bîbî) yan jî bi des serran a zîndanî di mendîbî, ravêrdê. Teslîmbîyayen û xayîney di gevîziyayîşê merdimanê teresan, sistekan, û bêbawerîyan ameynî çîmandê mi ver. Îşkence di verxudayen (direnmek) û qîsenêkerdena mi di rolê nê fikran zaf bi.

-Ti çend rojî destê polîsî di mendî? Nê wextî ra çendê ci îşkence di vîyart?

-Ez îşkencekaranê Estambul û Dîyarbekîr di vîst û çar rojî menda. Îşkenceyo fizîkî yo zey şokê elektrîkî û "askî" di alaqnayeni her roj çînebî, labelê şerîtê îşkencekaranî bi xo îşkence bi: Hucreyê bêhewa û tarî, bê werd û bê aw mendeni, bê kenef (tuwalet) vinderteni, neng (kufur) û heqaretê polîsan ûtb. (û tebayê bîni) her roj biyê zey îşkencî.

-Çî tewir îşkencey bi to kerdê?

-Semedo ki vera îşkencî teber a reaksiyonêndê xurt esto, îşkencekerdoxî zaf diqçet kenê ki îşkence ra pey şopê nêmano. Qandê ney jî çend rojî verê berdişê mehkema verêni ver, hinî (êdî) îşkenceyo fizîkî nêkenê. Hetta tanî heban û daruyanê (ilacanê) binan danê merdimî ki şopa îşkencî rew vîni bo. Bi kilmey kiştê metodandê îşkencî ra jî "teknîk" vera vermî (aver) şîyo.

Hem Estambul di hem jî Dîyarbekîr di îşkence bi mi kerd. Heta (kiştê) îşkencî ra jî

Dîyarbekîrî fina "çiyayeya" (ferqiyetê) xo musna. Îşkencekaranê Dîyarbekîr di heme çî hîna bi hawayêndo harkî û barbarkî bi. Gama ki ez "askî" di alaqnaye biya, finê (yew ray) ez xewiriyaya (xeriqiyaya). Finê jî halê mi zaf xirab bi, zeki ma vanî "halê mi hewale bi".

Bi kilmey metodê bîngêhinê îşkencî, "askî" û cereyanê elektrîkî bi.

"Askî" di engîstanê lîngan ra û heşa mîzî (penîs) ra cereyanê elektrîkî dayê. Gama ki waştê tesîrê cereyanê elektrîkî vêşî bibo, aw mi ro kerdê. "Askî" di testîsê kesî şîdênayê. Elektrîkdayîş û na mesela şîdênayîşî gege bê "askî" jî biyê. No wezîyet di, engîstanê destan ra jî elektrîk dayê.

Dewamê ci rîperê 9

VERG û ŞÊR û LUY

arêkerdox: Hagîdarê SEFERAN

Vanî rojî yew verg û yew şêr yaban ra tê reydi geyrenî, yew luy raştê jîni yena, vana:

-Bêrî, ma way û biray cê bî. A yo ki ma pêro xu insanan ra pawenî. Sowbî, heme gamî ma yaban ra geyrenî. Ez zî wazena (qeyl a) şîma reydi bigeyra.

Ê vanî:

-Wa bo, ti zî waya ma bî, ma xu rî piya bigeyrî.

Heme hîri tê reydi geyrenî, çî ki qîsmetê jîni beno, anî wenî û tanî zeman tê reydi vîyernenî.

Ray (gilangî) şonî, geyrenî, yew kavîr, yew kergî û yew arûş (hargûş) jîni dest kwenî. Yenî roşemî, şêr vergî ra vano:

-Birayê mi, wardî, nê werî (inê lepi) ma ri bar ki; wa her kes bara xwi bîwero (borû).

Verg wardeno pay, vano:

-Wa kergî wayê rî bo, arûş tû rî bo û kavîr zî mi rî bo.

Şêr hîma nişka ra hêrsî reydi wardeno, yew lekmatî binê gûşê vergî ra fineno. Vergê to çengîzêno, perreno ay raştê di kwenî; lîngê jey tê şînenî (şanênî), tê şînenî, ard di gevîzêno û mîreno.

Na ra (na ray) şêr vano:

-Waya mi, wextê jey tamam bî, birayê ma merd. De ti wardî, weynî ti nê werî se kena.

Luy vano:

-Birayê mi, kerga xu nîmajî, kavîrê xu testarey, arûşê xu zî şam (şan) di bîwerî.

Şêr vano:

-La ti?

Luy vano:

-Ez?

Vano: E, ti se kena?

Vana: -De ez kû bigeyra, çî ki qîsmetê mi bî.

Şêr vano:

-Mi aqîliyeya to nêdîbî, to no (ino) aqîl kura ra girawto?

Luy vano:

-Birayê mi, wexto ki owta lîngê birayê ma recîfîyay (refîşey), mi ay çax aqîl gîrewt*.

Anqera, Heziran 1991

*Mi na mesela Xal Mehemê Perikê rehmetî ra eşnawitîbî. Xal Mehemê Perikî çend aşmî (mengî) ra ver dîna xwi bedîlnay.

DÊRSÎM RA

arêkerdox: Kerem DÊRSÎMÎJ

ARÊ

Ap û biraza sonê arê. Arê de sire çînebeno. Biraza vano:

-Apo, bê ma kamî ke zêde zûrî kerdî, o raver nonê xo b'ariyo.

Ap vano: -Ya.

Biraza vano: -Vîrende tu qesey ke.

Ap vano: -A serre mi verê çemî de kundîrî ramitbî. Nî kundîrî henî ke bî gîrs, bî pîl, mêwê na kundîron çemî ser de şî bover. Ser ra kewran gurîyênê, şîyênê bover amênê.

Nara çî biraza vano: -Apo, par mi wast ke bekmez bigîrênî, leyê mi çînebî. Mi va "ez şêrî suke de leyê virajî". Neyse, ez şîyo suke, lewê nacarî. Mi ci rê salix da, mi va ke "mi rê leyê viraze, wa zaf gîrs bo." Nacarî çewres mordem tey gurêna, vengê çakuton jûvînî nêşîyênê.

Ap vano: -Heq adîrê to rê biraza! Zûro nanên hona mi nêdiyo. Nonê xo b'ariye, çîmanê mi ver a rew b'onçîye!

Şahiyeke ji bo zarokên Kurdan

Di 6'ê meha Tirmehê de, roja Şemiyê seet 14 00-21 00 li bajarê Stokholmê, li navçeya "Kungsträdgården"ê ahengek ji bo zarokên Kurdan tê amadekirin. Şahi ji alî Râdda Barnen (Dezgeha Parastina Zarokan Li Swêd) û Komîta Parastina Mafên Mirovî yên Kurda hatiye organîzekirin. Mebest ji vê şahiyê nasandina kultura Kurd û ji bo zarokên Kurd berhevkerina alîkariyê ye û her weha ji bo zarokên Kurdan alîkariyê berhevkin.

Gelek hunermendên Kurd û Swêdî yên navdar wê beşdarî şahiyê bibin. Ji yên Kurdan hin kes ev in: **Nazîr Rezazî, Şi-van Perwer, Merziye Rezazî, Necmeddîn Xulamî, Cûdî** û komên folklorî; **Koma Şengal û Koma Kurdistan.**

*Ji aliyê din Dezgeha Parastina Zarokan ya Swêdê dixwaze li Kurdistana Iraqê nexweşxaneyêke zarokan ava bike. Ji bo tesbîtîkirina ciyê nexweşxanê "Parastina Zarokan" wêdek pîspor şand Kurdistana. Wêdê çend ci pêşniyar kirin; Di nav van pêşniyaran de navên Diyana û Rewanduz, Ronya jî hene.

Sê bombe teqiyar

Piştî wê bi hefteyekê (25.6.91), îcar jî bombeyek ji wê bi tesîrtir dîsa nivê sevē di avahiya ku buroyên **Komela Mafên Mirovî** (Insan Hakları Derneği), kovara **Medya Güneşi** û **Özgür Halk** tê de ne, teqiya. Derî û pencerên van buroyan û yên avahiyên li der û dorên wê hemû şikes-tin

Dema serê sibê mesûlên van buroyan çûn buroyên xwe daku xesarê tesbît bikin, polisên li ber derî nehiştin ew têkevin hundur. Polisên dest dane ser hemû arşivên wan. Rismê hemû endam û yên di arşivên wan de ne, birin.

Li Diyarbekirê gelek rêxistinên demokratîk li ser van bûyeran beyan dan. Li ser navê Komela Mafên Mirovî li Diyarbekirê; Nazdar Kahramaner, Fevzî Veznedaroğlu û Hasan Beksek di beyana xwe de piştî ku behsa bûyerê dikin, li dawiyê bi kurtî weha dibêjin: "...Karûbarên Komela Mafên Mirovî; lêkolîna kirinên li dijî mafên mirovî,

kêmkirina wan û di dengê giştî de belavkirina wan in. Alîyên ku li dijî mafên mirovî radiweste jî hêzên dewletê ne. Xebata me wê bi tîne li hember wan be.

Bi ya me wê bûyerên weha bi dawî neyên. Lê eger armanca wan bûyeran 'çavtirsandin' jî be, emê li ser xebata xwe berdewam bin."

Dîsa li ser navê hin rêxistinên demokratîk ên li Diyarbekirê jî beyanek hate dayîn ku ew jî van bûyerên dawî protesto dikin. Rêxistinên ku navên wan li binê vê beyanê hatine nivîsîn, ev in:

Hasan Hüseyîn Ebem (Özgür Halk), Vahit Aba (Medya Güneşi), Mazhar Kara (kovara Deng), Nusrettin Masin (kovara Newroz), Leyla Zana (rojname Yenî Ülke), Abdulvahab Kaya (Tüm Sağlık Sen), Mehmet Yıldız (serokê şubeya Petrol İş), Vedat Aydın (serokê HEP'a Diyar-

bekirê), Nazdar Kahramaner (endama Komîta Karger a İHD'ê), M. Sıddık Demirel (Eğit-Sen), Cezmi Kenan Arkuş (serokê Partiya Sosyalist, li Diyarbekirê), Ali Öncü (serokê Tes-İş), Vezîr Perişan (serokê Belediye-İş), Musa Çelik (serokê Yol-İş)

Li dij van bûyeran buroyên meslekî yên li Diyarbekirê jî bi hev re beyanek çapemenî dan ku bi kurtî weha dibêjin:

"...Gava ku ev êrîş li dij Komela Mafên Mirovî jî tîne kirin, mirov dikeve şikê. Ji ber ku ev êrîşên ku îro hedefa wan Komela Mafên Mirovî û kovar û rojname ne, sibê wê berê xwe biguherine ser hemûyê civatê. Bi êrîşên weha, armanca wan ew e ku çavên xelkê bitirsînin, wan terorîze bikin. Dixwazin muxalefeta demokratîk a ku roj bi roj pêşde diçe û geş dibe biftîsinin.

Kurd û Seddam hîn jî li ber...

meniya cihanê de wek vegera wî ya Kurdistana ket çapê. Ji wê rojê, heta 7'ê Hezîranê Mesûd Barzanî diyar nebû. Vê yekê, rê jî spekulasyonan re vekir. Radyoya Îsrailê bi beyanê şik xurttir kirin; "*Seddam Huseyin dest daniye ser Mesûd Barzanî*". Û her wisa hat gotin ku "*Mesûd Barzanî mewanê Seddam ê bedil e*".

Berî ku ava li ser spekulasyonan zelal bibe, di 7'ê Hezîranê de beyanêke Mesûd Barzanî li dinê belav bû. Herçiqas di beyanê de M. Barzanî dibêje "*em gihiştine encamên baş*" jî, ji tevayîya beyanê xuya dibe ku wêda Kurdan û ya hukûmeta Iraqê li ser pirsên esasî -wek sinorên Kurdistana, maf û azadiyên devera otonom- li hev nekirine. Li gor beyana Mesûd Barzanî, li ser avakirina demokrasiyê li hev kirine ku ji beyanê jî diyar e ku gotinên li ser de-

mokrasiyê tev temennî ne.

Bi deh rojan piştî beyanê, Mesûd Barzanî vegeriya Kurdistana. Li gor nûçeyên ji Kurdistana tîne, Mesûd Barzanî û piraniya serokatiya Cephê, li gel înzekirina otonomiyê ne. Lê Celal Talabani li dij e. Otonomiya ku her du alî heta nuha li ser peyivîne, di çerçewa otonomiya Sedam a berê de ye.

Piştî vegera wêda Kurdan ji Bexdadê, Seddam Huseyin hin şertên pêşin ên giran avêtin ber Kurdan. Şert ev in; "*Divê hêzên Kurd çekên xwe teslîm bikin, bi welatên Rojava re têkilîyan bibirin û ji bo emniyeta Iraqê, hevkarîya Baasê bikin, li dijî dijminên Iraqî yên der û hundur bi Baasê re hevkarîyê bikin*". Roja 29'ê Tebaxê Cepha Kurdistana, ew şertên Sedam Huseyin red kirin û gotin "*divê sinorê Kurdistana otonom firehtir*

Em;Buroyên Meslekî van bûyerana wek erîşeke ku li dij hemû hêzên demokratîk hatiye kirin dibînin û protesto dikin. Divê dewlet biçe ser van hêzên tarî û wan eşkere bike. Yan na ew bi xwe mesûlê van erîşan e, divê were zanîn.

Mahmut Ortakaya, (Serokê Buroya Tebîbên Diyarbekirê), Turhan Sesli (Serokê Buroya Weterîneran), Mehmet Vural (Serokê Buroya Muşawîrên Malî), Recep Çetin (Serokê Buroya Muhendisên İnşaatê), M. Salih Güneştekin (Serokê Buroya Muhendisên Makînan), Özer Erdemli (Buroya Muhendisên Elektrîkê), Ahmet Cengiz (Buroya Mîmaran), Fethi Gümüş (Serokê Baroya Diyarbekirê), Hıdır Ensari (Serokê Buroya Dermanxaneyan), Ümit Arıkan (Serokê Buroya Dixtorên Diranan), Zekai Bakar (Serokê Buroya Muhendisên Zire'etê), M. Behlül Yavuz (Buroya Esnaf û Senetkaran)"

be: Ker kûk û hin bajarên din jî têkevin ber."

Li gor çapemeniya cihanê, wê Mesûd Barzanî ji bo cara dawî here Bexdadê.

■ Ji aliyê din piştî 10'ê Hezîranê leşkerên Amerîkî ji Dihokê vekşiyar û herwiha li ser vekşandina bi temamî, Amerîka hin hazîrî kirin. Xelkê Dihokê ev yek protesto kir û bal kişand ser xeteriya erîşek muhtemel a Iraqî û diyar kirin ku 37 polisên Netewên Yekbûyî tîra parastina wan nake.

Li ser vê yekê Civaka Ewrûpayê di civîna xwe de biryar da ku leşkerên welatên endam ji Kurdistana Iraqê venekîşin, heta şertên pêbawer li Iraqê ji bo Kurdan ava dibin. Herwisa evan dewletan ev biryar bi Amerîkayê jî da qebûl kirin.

M. Bextiyar

Seddam ji sedî 70 daxwazên me...

girtin. Riya aşitîyê vebûye. *-Hunê mesela Kerkûkê çawa çareser bikin?*

-Bi ya min Kerkûk ji Kurdan re be yan na, ev ne problem e, çimkî Kerkûk jixwe ya Kurda ye. Nuxta ku em li ser li hev nakin ew e ku em dibêjin îdara bajarê Kerkûkê bila di destê me de be, Seddam dibêje na, em bi hev re îdare bikin. Ev jî li hember otonomiyê ne asteng e. Ji xwe ger tu ji me bipirsî, em dixwazin tevayîya Kurdistana azad bikin. Lê em li gor îmkânên xwe dixebitin. Nuha bi tenê hewqas ji destê me tê.

-*Bi Seddam re rûniştin, pê re lihevkin ne zehmet e?*

-Ji bo şadî û refahê xelkê xwe divê em bikarîyê bi herkesî re rûnin, biaxifin.

Em hertim terefdarê aşitîyê bûne. Her çi wexta ku dijmin aşitîyê bixwaze, em amade ne. Lê em xwe ji şer jî nadin paş. Ger bi bombe û silehên xwe werin ser me, emê jî bi zimanê wan bersiva wan bidin.

-*Hêzên Hevkar ji Kurdistana Iraqê vedikişin, ma hûn çûna wan dixwazin?*

-Vekişin yan na, li ser vê yekê em nepeyivîne. Çimkî wexta ku hatin bi me neşewirîn, wexta ku vedikişin jî bi me neşewirin.

-*Gelo sebeb çi bû ku hêzên emperyalîst hatin Kurdistana Iraqê. Tê gotin ku ji bo alîkariya insanî hatine. Gelo hûn çi difikirin?*

-Bi min ji bo alîkariya insanî hatine. Lê pîrsa me ne pîrsa insanî û mul-teciyan e. Ne pîrsa tî û birçimayîne ye. Pîrseke


siyasî ye. Çareyeke siyasî jê re divê. Eger bi awayekî siyasî piştigirîya me nekin, alîkariya insanî tiştêkî ifade nake.

-*Hin, we li Rojhilata Navîn wek çeteyêke emperyalîzmê dibînin, hûn çi dibêjin?*

-Xwedê aqil bide wan. Ev xwediyên bir û bawerîyeke welê ne ku her kesê li derveyî xwe, ajan dibînin. Baş e dunya hemî çewt e, qey tenê ew li ser rîya rast in. Bîr û baweriyên weha bi kêrî Kurdan nayên. Nêrîn û berdewamiya karên weha ji bo Kurdan xeterîna me dîzayîna me ye. Kurdan bi xwe, bi Serokê wan û bi eskerên wî re çîrokê xurttir girêdane û ger roja me xeterîna wan têkilîyên wan çareser bikin.

Xaçepîrs

Amadekar: S. Rêving



Çeperast

1- a- Ciwan, xweşik, spehî b- ber, eser 2- a- Navê meheke payîzê b- kûçik c- pirtika pirjimarê di kurmançî de (berevajî) 3- a- Xwendina herfeke bêdeng b- hereketa biçûk, tevgera pîr biçûk (berevajî) 4- Çaydanê mezin yê ku ava germ û ya tovçayê bi hev re dixîne. b- Ji navê keçikan. 5- a- Navê meheke biharê. b- Formê emir ji fiila "rabûn". 6- a- Navê meha ku mirov rojiyan digre. b- Belê, e. 7- a- Bi awayekî şaşmayî û mezinbûyî vebûna çavan. b- cih, war (berevajî). 8- a- Navê heywanekî kovî ku di kuran de dijî û bi dûxanê jî kuna wî derdixin û neçîra wî dikin. b- ava şekir (berevajî) 9- a- Bi soranî: "gelo". b- Berxê zû zayî (berevajî) c- ne dereng (berevajî) 10- a- 365 roj. b- nexêr, na. c- sînonîmeke "tûk", ava ku hinek

hormonên di laşê mirovan de çêdikin û bi rîya dev derdixin der (berevajî) 11- a- Li dorhêla qeza Elke (Beytuşebab) çiyayekî bilind (berevajî) b- Navê darekê. c- hal, halet (berevajî) 12- a- Navê kuran b- Di Kurmançî de paşkoka veqetandê nebin avkirî.

Serejêr:

1- a- Kesê ku tişta zû ji

Bersîva Hejmara 115'an

Çeperast: 1-a)Mahabad, b)Xanî. 2-a)erê, b)êr, c)olan. 3-a)ma, b)îrsim, c)îm. 4-a)ûmeh, b)aye. 5-a)darbest, b)em. 6-a)îrem, b)îtrap. 7-a)nig, b)tî, c)il. 8-a)reprep, b)bi.9-a)Zaxo, b)oç, c)wan. 10-a)Elegez, b)rec. 11-a)war, b)wêran, c)çi. 12-a)îbzit, b)epîs.

Serejêr: 1-a)Memûzîn, b)zewî. 2-a)aram, b)ri-falab, 3-a)hê, b)edeg, c)xerz. 4-a)îham, b)rog. 5-a)bêr, b)te, c)ewt. 6-a)arsab, b)îp, c)zê. 7-a)êî, b)ro, c)re. 8-a)mast, b)erçap. 9-a)xo, b)trîp, c)enî. 10-a)Alîa, b)al, c)wc. 11-a)namyep, b)ba. 12-a)în, b)em, c)hingil.

QELÊN

Zinê

Apo Osman Sebrî dibêje: berî gişî divê mêrikê Kurd keça xwe nefiroşe, paşê bide xwendin û dûre riya xebatê li ber wê veke. Divê jin û mêr ne li ser esasê qelen, lê li ser esasê hezkirinê hevdu bikin. Divê em heqê jinê nas bikin, lê divê ew bixwe ji heqê xwe nas bike.

Civaka Kurd bi dest dê, wenda bûye. Dê hatiye kirin û firotin. Dema tu ji mêrê Kurd re bibêji: ez hatime keça te bikirim, ewê gullan bera te bide û te bikuje. Lê gava ku tu bêji: qelenê wê çi qas e? Wê kêfa wî were. Mesela, xelata apê, xelata xalê û ya birayê mezin. Ew jî heqê serhevde-tiya wan e.

Kurd dibêjin namûs tiştêkî pir buha ye, ne tê kirin û ne tê firotin. Û çirokêka din a Kurdan heye, dibêjin rojekê maleka Kurd bûka xwe bir zeyî, bi rê de dema ku çem qut dikin, di orta avê de, lingê bûkê dişemite, tu namîne ku bi ber avê de here. Bi hev re dibêjin, "de bila here lo, ma qey me perê xwe tê daye". Bûk digihîje mala bavê xwe, heftek-dudu, mehek, bala xwe didinê bûk venagere mala mêrê xwe. Dibêje: heta hûn qelenê min nedin ez venagerim. Dibe nabe, bi bergerê û sergerê bûk venagere. Radibin qelenê wê didin û vedigerînin malê. Di veqerê de dema digihîjin orta çem, bi bûka xwe digrin û bi yek dengî dibêjin: malneketino

pê bigrin, me pêşek pere tê daye.

Heya roja îro li ba piraniya Kurdan ev gotin û ev çirok bûne fatihe û ayeta ku pê bazara qelenbirinê dikin. Bazar e!! Mêrik bi hezaran dijmerin... Ji bona xatirê cim'atê û risipî, kalemêr û pîrejînan çend hezaran datînin, razîkirina birayê mezin û şîrhelalkirina dê û parastina papaziya bavê, dibe kelem di riya daxistina çend hezaran de. Erê mixabin bazar e. Ferqa bazarkirina jinê û dewêr tenê ew e ku hefsar nekirine hustiyê jinê û ew nebîrine orta mazatê. Kirin û firotin e. Bazar tim bazar e, çî li orta mazatê be û çî jî di qesran de li ser doşekan be.

Pirbûna qeleng li ser bihabûna tiştan, çek û zêran dimîne. "Ma çî zemanan bûk bê zêr bûne". Mixabin, pirê caran zêdebûna qelen dimîne li ser diploma keçikê, bilindbûna navê malbatê û bedewiya wê. Bextê xortê Kurd î reş e, ne mêzînek e û ne dudu ye. Vê yeka hanê em pir bi şûnde hiştine û bûye sebebê hevdurevandinê; heyfîlanînê û kuştinê. Û gelek xortên me heya ber çil saliyê azib dimînin ji bo ku karibin qelen bidin hev, yan jî di çin bi keçikên milletên din re dizewicin. Ma gelo mesele malavakirin e yan malxerakirin e?

Ferhenga Lîteratûrî

Amadekar Bavê Nazê

Naverok û Form

Ji bo jihevderxistina berhemê lîteratûrî, pêwîst e her du aliyên wê: yê hundir (naverok) û yê ji der ve (forma) bêne xuyakirin ku ew jî wek xwîn û çerm bi hev ve girêdayî ne.

Bixwe em pê dizanin ku naverok û forma du kategorî ne (mequlên) ku di hemû diyardeyên xwerist û civakê de peyda dibin. Yanî çî tiştê ku heye, her du aliyên di xwe de gewde dike. Bi gotineke din, divê her diyardeyek xwedî reng û cewher be. Helbet di edebiyatê de naverok û form xwedî dimen û pêwendiyên taybetî ne. Di berhemê lîteratûrî de terkîba naverok û formê pirqat, piralî û aloz e. Wek nimûne, dengdana ji der ve; qafiye û nebret dibin reng ji mana bêjeya edebî ku di vir de ew bi xwe jî bi rola naverokê radibe. Li aliyekî din, fikir û sujet (wek elementên formê) di karakteran de mîna perçek ji naverokê gewde dibin. Bi vî tiştî tê xuyakirin ku naverok û form di berhemê edebî de wilo bi hevdu ve hatine hunandin ku sînor di nav wan de nayê danîn, bi çavan nayên dîtin. Ji ber vê çendê xêzkirina sînor û belûkirina elementên naverok û formê di edeb de abstrak (soyut, mucered) e.

Bi vî yekê em dikarin bibêjin ku di edeb de yekîtiya naverok û formê hetmî ye (bê wê nabe) û nabe ji hev bêne veqetandin. Herçî forma di edeb de ne kirasê ku

mirov kêla bixwaze, wê bika-ribe ji bedenê xwe bike. Ew rûçikê laş e û bêyî hev tu carî nabin. Lewra jî ew maqula ku tê gotin, di edeb de rola yekem ji naverokê re ye û ya duyem ji formê re ye, ciyê xwe nagre û ne rast e. Bi tenê divê bê gotin ku ew hev temam dikin. Ji bo rastiya gotina me, mînak pir in: hema elementek ji yên naverokê, yan yên formê bikeve, êdî berhemê edebî diherife û wek terxanek hunerî winda dibe. Jixwe giranbuhayiya berhemê di mana wê ya kûr de û di spehîbûna huneriya wê de ye.

Bi xwe mequla diyalektîkî ya ku Hegel dibêje: "Form derbasî naverokê dibe û tê de tê guhertin", careke din yekîti û lihevquncîna formê û naverokê dide xuyakirin. Hun jî dîna xwe bidin prosesa afirandina berhemê lîteratûrî: Di destpêkê de nivîskar bûyerê bi tonê xeberê dibihîse. Ew dibe naverokê ter ji bo berhemê ku hîn bi temmetî di serê nivîskar de ne meyaye. Daku ew bûyer bibe xwedî qîmetek hunerî, pêwîst e formeke edebî bistîne. Dibe ku ew form bi şîrî be, yan bi peşane be. Dûre bi xêzên pêşketina bûyeran (sujet) û bi çarçewa fikra giştî wêneyên wê direqifin hev (kompozîsyay). Jixwe elementên bingehîn yên formê jî ev in.

Heger careke din em bidin ser şopa jihevderxistina naverok û forma berhemê edebî, êdî emê bi awakî abstrak di naverokê de pêrgî van ele-

mentan bibin:

1- Têmatîka. Rengvedana karakter û dijîtiya civakî û dî-rokî ye. Em bibêjin wek têma bêtifaqiyê ya di hin çirokên Kurdî de.

2- Problematîka. Fehma nivîskar ji wan karakteran. Ji têma bêtifaqiyê, problema bî-rakujiyê çêdibe.

3- Teqyîma nivîskar û nêrî-na wî li ser her du xalên li jor.

Hîn di heyamê xwe de Çernîşevskî ev her sê aliyên naveroka berhemê di lêkolîna xwe ya bi navê "Pêwendiyên hunermendiyê yên spehîbûnê û heyînê bi hev re" de dabû xuyakirin ku pê-wîst e pêşî em heyînê (waqîi) istîab bikin. Dûre divê em jiya-nê rave bikin û dawiyê jî em hukmê xwe li diyardeyên jiya-nê bikin.

Heger em elementên formê di xalan de bicivînin, emê van her siyan berbiçav bikin:

1- Zimanê berhemê edebî

2- Sujet (Xêzên pêşketina bûyeran)

3- Kompozîsyay (Sistema avakirina berhemê)

Di wexta xwe de ji bona girîngiya xuyakirina yek sewiya ya form û naverokê, Hegel li ser "îlyada" bi vî rengî di-nivîse: "Em dikarin bibêjin ku naveroka 'îlyada' şerê 'Terwada' û xezeba 'Aşîl' e. Ev her tiştî li ser wê destanê dide me û di eynî demê de tiştêkî nade me. Ji ber ku tiştê 'îlyada' dike îlyada ew forma destanî ye ku naverok tê de hatiye gewdekirin".

Adres, telefon û telefaksa me hat guhertin

Adresa me ya nuh ev e:

Armanc
Box 152 16
161 15 Bromma / Sweden

Telefon: 46-8-803135
Telefaks: 46-8-801825

Fîsa abonetiya Armancê

Abonetiya salekê

- Salek
 Şeş Meh

Li Skandinavya	150 SEK
Maqam/Myndigheter	250 SEK
Li Ewrûpa	50 DM
Li derveyî Ewrûpa	35 \$

Tarîx:

Nav û paşnav:

Navnîşan:

Welat:

Postgiro: 50 37 99

Heqê abonetiya xwe li in. Fotoko-piya kvitoya heqê abo- in. Adres: Box 152 16, 161 15 Bromma/Sweden

ne karê aqîla ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

◆Dewleta Malezya jî bo xwendevanên xwe yên ku li welatên din dixwînin, salê 6 milyar dolar xerc dike. Butça unîversîteyên Malezyayê jî nêzî milyarekê ye.

◆Xwîna ku mirov ji navîka zarokê/a nûzayî distîne, dikare diyar bike ka tendensên allerjîyê di zarok de hene yan na.

◆Dema mirov bezelye û sebzeyên ji cînsên bezelye tevî kartolan diçîne, heywanên wek kûrm, kêzik û hwd nikarin zirarê bidin kartolan. Lêkolînerên Îngilîz nika dixebitin ku gena bezelyeyê derbasî kartolan bikin.

◆Li gor lêkolînên ku hatine kirin, zarok di nav nivîna xwe de zewa herî baş dikin. Wek tê zanîn gelek caran dê û bav zarokên xwe di nav nivînen xwe de dikin xew. Li gor lêkolîneran ev kirina dê û bavên zirarê dide zarokan.

◆Weke ku her sal meha tîrmehê li Diyarbekirê musabaqa zebeşan dikin, di Çiriya Pêşîn sala 1987'an de li Morrisville, Vermont DYA jî musabeqa navnetewî ya kundiran tê bi rêxistin. Yekî bi navê Don Fleming bi kundirê xwe yê 75 cm dirêj û 274 kg giran dibe şampiyon.

◆Steve Newman ji Bethel, Ohio Lîdya di nav çar salan de bi peyati 20 welatan geriya û 24 800 km rê çû.

Di meha hezîrana 1987'an de Grönlandê çiyayek ji bûzê (qeşa) firote Japonayê. Çiyayê jî bûzê jî ber mezîniya wî, pêşî kirin du şeş û paşê li kêştiyan bar kirin. Dema anîn Japonayê du şeşên qeşayê car din kirin yek.